Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

# Agirî

Hejmar: 160
5'ê Hezîrana 2011
Buha: 150 Tûmen

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi

## Bûyera "Amya"yê bû sedema kirîza dîplomatîk a Îranê

**Wezîr –terorîstê rejîmê ji xaka Bulîviyê hat derxistin**




## Cinayetek din a rejîma Îranê: Kuştina keçê li merasîma binaxkirina bavê wê de

R:2

## "G8" ji guhertinên demokratîk li Îranê de piştevaniyê dike

R: 4

**Mistefa Hicrî: civaka navnetewî û bi taybet Amerîka hewceye zêdetir pêşiya** destêwerdanên Komara Îslamî li kar û barên deverê de bigrin.



R: 3

# "Îna Zarokên Azadiyê" bi xwînê sor bû




**Serbarê cinayetên zêdetir û tund û tûjiya rijidtir ji aliyê hêzên Sûriyê ve, serhildana xelkê jî germ û girseyîtir dibe.**

Roja Înê li seranserî Sûriyê de meşên nerazîbûnê birêve çûn, ku li bajarê Şamê û derdora wê de meşvan bi druşmên dijî serokê Sûriyê û rejîma wî daketin kolanan. Xelkên Helebê jî dengê xwe tevî bajarên din kirin û doza azadiyê û rûxandina rejîma Sûriyê kirin.

Li Qamîşlo, Amedê û Kobanê de jî, bi hezaran xelk meş li darxistin. Ji aliyekî din ve, dema ku li deverên Şam, Himsê û çend bajarên din yên ku Ereb lê dijîn, bi hezaran xelk kom bûn, hêzên Sûriyê bajarê Hemayê kirin gola xwînê.

Heta niha li gor daxûyaniyên çavdêrên mafê mirovan 67 kuştî li bajarê Hemayê hene. Her weha di van her du rojan de jî, di encama topbarana hêzên Sûriyê, çavdêrên mafê mirovan ragihandin ku jimara kuştiyan gihîştiye 66 kesan.

Hêjayî basê ye ku meşvanan bo nîşandana nerazîbûna xwe derheq kuştina zarokan navê "Înê zarokên azadiyê" danîne ser roja Înê 3'ê hezîranê.

## Heyetek PDKÎ di rê û resma 36' mîn salvegera damezirandina YNK'ê de beşdarî kir

R: 2



## Mesûd Tek: "Tifaq û lihevhatina hêzên Bakûr, ne tenê li ser hilbijartinê, belkî li ser piroseya piştî hilbijartinê ye jî"



R: 5



## Konferansa neteweyî

Ebdula Hicab

Pêwîstiya li hev hatina rêkxistin û partiyên siyasî ên Kurd ji bo avakirina sîwanek hevbeşe... R: 4



## Heqîqet heya dawiyê veşartî namîne

Senar Hatemî

Êrîşa ser nawendên bazerganî û nîzamî yên Amerîkayê bûyerek girîng, bijan û li heman hal de...

R: 6



## Zarok; hêviyên pêşerojê yan kesên dorandî

Keyhan Yûsifî

Bê guman, hewldan û guherînên siyasî û civakî di cîhanê de bi armanca jordeçûna asta... R: 9



## 50 sal xebat di radyo Yêrîvanê de

Tîtalê Kerem

Sala 1918' an, pareke gelê Kurd, ku ola êzidî bûn, ji destê zulma Roma reş nava şevekê de ji cih û warên xwe... R: 10

# Peyama Deftera Siyasî a PDK Îranê bi boneya 36' mîn salvegera damezirandina YNK'ê

Birêz/ mam Celal Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê!
Birêzan/ Endamên Serokatiyê!
Bi boneya 36' mîn salroja damezirandina Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê, em poîrozbahiyên germ ên xwe pêşkêşî we û di riya we de jî bi sercem alîgirên Yekîtiya we dikin û geşekirinek zêde bo we hêvîxwaz in.
Her di vê derfetê de em pêdagiriyê li ser pêwendiyên dostane ên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê dikin û kûr û berîntirkirina van pêwendiyan, di berjewendiya giştî a netewa Kurd de dibînin.
Hêvîxwazîn ku Yekîtiya dost û birayên me di berhevkirina wan armancên ku di pêxemê de hatiye damezirandin, serkevtî be.
Car din pîrozbahî û serkevtin

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**
**1'ê Huzîrana 2011'an**

## Sergotar

# Seferek kirîzafir

**Arîn**

Vedana her rûpel ji dîroka Komara Îslamî, bîrhênerê cinayet, teror û terorperweriyê ne; vêca çi ya neyar û rêberên opozîsyonê, çi jî kuştinên bikom û terorîzma navnetewî. Lewma gelek caran tiliya tawanbariyê bo aliyê wê hatiye rakişandin û riswayî û biryarên navnetewî yên siyasî li peyre hatiye û bi vê çendê jî, siyaseta derve ya rejîmê tim bi kirîz û astengên dîplomatîk re berbirû bûye.
Kiryara terorîstî a li Arjantînê (nawenda serekî a cihûyan ''Amya'') di sala 1994'an de, yek ji wan nimûneyan e ku dews û destê Komara Îslamî têde eyan bû û cezayên siyasî û dîplomatîk li dor girtina çend kes ji bepirsiyarên payebilind ên rejîmê jêre kirine xelat. Polîsê navnetewî jî li ser esasê dadgeh û serdozgeriya Arjantînê li sala 2007'an de biryara girtina berpirsiyarên rejîma Îranê û Hizbullahê da û ji 186 welatên cîhanê xwast ku li vê derheqê de hevkariya înterpolê bikin.

Fermanderê wê demê yê hêza Quds û Wezîrê niha yê Berevaniyê, terorîst Ehmed Wehîdî jî yek ji wan e ku pêka hukmê han li bin lêgerîna polîsê navnetewî de ye. Lê navhatî bêy guhdan bi wî hukmî û li ser vexwendina Wezîra Berevaniya Bulîviyê bo beşdarîkirin li cejnek leşkirî de bi fermî serdana wî welatî kir, lê piştî çend seetan ji serdana xwe, berpirsiyarên Bulîviyê li bin zexta raya giştî û nerazîbûna Arjantînê de bi hurmet ve ew neçar hiştin ku bi lez û bez xaka wî welatî biterikîne!!
Pêka yasaya Înterpolê diviya ew li dema derketina ji Îranê bihatiba girtinê, lê pêwendiyên bazerganî, leşkirî û siyasî ên Îran û hevalbendiya çepgir a Amerîkaya Latîn ''Alba'' bi taybet Bulîwiyê, ku bi awayek stratejîk li dijî xurtbûna nifûza Amerîka li cîhanê û Rojhilata Navîn de ne, karî pêşiya girtin û spartina wî bi edaletê bigre; lê nekarî pêşiya şoka siyasî bi cendekê dîplomasiya lawaz a rejîmê û ketne rojeva cezayên navnetewî li dijî berpirsan û îzoletir bûna wê bigre.
Herweha renge wê sefera nîvtemam a Wehîdî hin armancên rejîmê jî weke azirandina siyasî, erzîşa teblîxatî, bêhitbar nîşandana dadgeha Arjantînê bicih anîbe, lê carek din cinayetên rejîmê û hewcehiya girtine ber a rê û cihên tundtir li dijî wê sîstema dijîmirovî bibîr xist û lawaziya dezgeha dîplomasiya rejîmê û îzolebûna wê jî nîşan dide. Bi taybetî li vê midehê de ku zêdetir tûşî asteng û kirîzan hatiye; vêca her ji Nîciriyê, Sinigal û Gambiyayê re bigre heya Kuwêt, Behrên, Erebistan, Yemen û bi taybet li Misrê de ku dixwast piştî nemana Husnî Mubarek wek derfetek ji bo topşeqanêya xwe bikar bîne. Herweha hevdem li gel vana de, çend rojan berî niha jî rejîmê asîmanê Îranê bi ser balafira taybetî a seroka Alman, Angela Mêrkil de daxist û bi vê çendê jî bazneya kirîza siyasî û dîplomatîk a xwe berfirehtir kir û wusa dixuye ku niha şûndetir jî bi dijwariyên zêdetir re berbirû bibe, ku bêguman bac û zirarên wê jî dê bo rejîmê girantir bin.

# Beşdariya heyetek PDK Îranê di rê û resma 36' mîn salvegera damezirandina YNK'ê de

Li ser gazîkirina fermî a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê, heyetek Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi serokatiya birêz Hesen Şerefî, Cihgirê Sekreterê Giştî, birêzan Mihemednezîf Qadirî, Endamê Deftera Siyasî û Tahir Mehmûdî, Endamê Komîteya Navendî ên PDK Îranê, piştî nîvroya roja Çarşemî, 1'ê Hezîranê li bajarê Hewlêrê di 36' mîn salvegera damezirandina Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê de beşdarî kirin û ji aliyê heyetek Mekteba Siyasî a Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê ve bi serokatiya birêz Kusret Resûl Elî Cihgirê Sekreterê Giştî yê Yekîtiyê û hejmarek ji endamên mekteba siyasî û berpirsên vê yekîtiyê ve li bajarê Hewlêrê bi germî hatin pêşwazîkirin.



Heyeta partiya Demokrat, tevî pêşkêşkirina qevtkegulekê, pîrozbahiya Deftera Siyasî a PDK Îranê bi Mekteba Siyasiya Yekîtiyê ragihandin.
Ji aliyek din ve heyetek PDK Îranê bi serokatiya birêz Çeko Rehîmî, endamê Komîteya Navendî yê Partiya Demokrat, her bi vê boneyê ve di rê û resma Melbenda 14 a Rêkxistina Yekîtiyê li bajarê Koyê de beşdar bû.
Heyeta partiyê qevtkegulek û peyama Komîsyona Pêwendiyên PDK Îranê pêşkêş bi berpirsê melbendê û berpirsên Yekîtiyê li Koyê kir.

# Cinayetek din a rejîmê; Kuştina keçê li merasîma binaxkirina bavê wê de

**Çend rojan berî niha mirovkuj û cinayetkarên rejîma Îranê cinayetek din afirandin û Hale Sehabî, (keça Izetula Sehabî ji avakerên şêvra Milî- mesebî) li merasîma bi xakspartina bavê wê de bi lêdan û kutanê kuştin.**
Hale bi xwe jî li girtîgeha Komara Îslamî de dibe û bona beşdarîkirin li merasîma veşartina bavê wê de bi awayeke demkî tê berdan û roja din ku xelik bona oxira kesê mirî kom dibin, hêzên rejîmê êrîşê dikine ser xelkê û li encam de Hale Sehabî, keça kesê mirî li bin derbên lêdan û kotan û tund û tujiya hêzên ewlekarî de demildest canê xwe ji dest dide. Ew ji tirsa kombûn û nerazîbûna xelkê, dereng şevê li bêdengiyê de Halê li rex qebrê bavê wê de diveşêrin. Kuştin û veşartina nepenî a Hale Sehabî û hezaran Haleyên din, ji nimûneyên berçav yên cinayetên hikûmeta Îranê ye ku bi tawana beşdarîkirin li merasîma binaxkirina kes û karên xwe de bêguneh tên kuştinê.



# Miladîç li Laheyê derket pêşberî dadgehê

Generalê Sirbî, Radko Miladîç ku bi komkujiyê tê tawanbarkirin, li dadgeha Tawanên Sûc ên Navneteweyî ya Laheyê cara yekem derket pêşberî dadgehê. Dadgehê di destpêkê de ji Miladîç xwest ku ew xwe bide naskirin. Miladîç wiha bersiva pirsê da: "Ez General Radko Miladîç im!"
Paşê cih û devera jidayîkbûnê jê hate pirsîn. Dîroka ku Miladîç got û dîroka qeydên dadgehê wekî hev derneketin. Miladîç bi israr got ku dîroka ku ew dibêje rast e.
Miladîç di berdewamiya dadgehê de diyar kir ku "ew nexweşekî bê eman û li ber mirinê ye."
Dozgerê dadgehê ji Miladîç re got 30 roj dema wî heye ku van tawanên li ser xwe bipejirîne an red bike. Miladîçê ku nexwest tenê parêzerek parastina wî bike, diyar kir ku ew dixwaze 'parastineke wî ya tekûz' hebe.
.Rizgarî Online /




www.arsivakurdi.org

## Gotara Sekrterê PDKÎ di awahiya Kongirêsa Amerîkayê de

# Mistefa Hicrî: Heya rejîma han bi ser Îranê de zal be, xelkê Îranê û deverê rûyê aştî û tenahiyê bi xwe ve nabînin




Mêvanên hêja!

Xûşk û birayên xweştevî!

Di destpêkê da îzna min bidin sipasiya hemû wan kesan bikim ku hewl bo pêkanîna vê civîna girîng dane.

Binpêkirina mafê mirov di Îrana Komara Îslamî de, bi awayek rêxistinî a dewletî li ser bingehek îdeolojîk dameziriye û weke erkek olî birêve diçe.

Kevirbarankirin, birrîna endamên leşê mirovan, cezaya heya îdamkirinê ji bo cudabîran û gellek cezayên din ku ji kes veşartî ninin û pêtir ji 30 salan e di Îranê de rojane birêve diçin û hemû cîhan şahidê vê hovîtiyê ne û hûn jî jê agehdar in.

Eva ku di vê derfetê de ez dixwazim li gel ve bas bikim, stema çendqat e ku derheq bi netewên Îranê ên ne Fars birêve diçe ye, ku pêtir ji nîva xulyaqeta nizîk ji 80 Milyon kesî a Îranê pêktînin, ev jî pêk tên ji netewên Turk, Kurd, Ereb, Belûç û Turkmen an.

Kerb û kîn û jinavbirina xelkê, bingeha siyaseta navxweyî û derve a vê rejîmê ye û heya rejîma han bi ser Îranê de zal be, xelkê Îranê û deverê rûyê aştî û tenahiyê bi xwe ve nabînin. Ku va ye, ramalîna vê rejîma serberedayî û damezirandina hikûmetek demokratîk ku mafên netewên Îranê berhev bike, take riya misogerkirina tenahî û aşitiyê di Îran û deverê de ye.

Siyaseta giştî ya Îranê, ji damezrîna desthilatdariya paşayetî a Pehlewî ve heya niha, bi bê liberçavgirtina van netewane û dehan ol û zimanên cuda ji hev berdewam bûye ji avakirina Îranek yek netewe, yek ziman û yek ol.

Di encama vê siyasetê de, hemû givaş û zorek bikar aniye ji bo ku hemû netewan bi ol û zimanên xwe ve di xwe de bihelîne û jinav bibe. Di vê pêwendiyê de nek her jiyan û serpêhatiya olên Behayî, Cihû, Mesîhî û Ehliheq ku bisilman ninin, bûye tirajîdyayek mirovahî di Îranê de, belkî heta pêrewên olên cuda ji îslama hikûmetî weke derwêşên Gunabadî û Sunnî jî ku bisilman in, baştir ji rewşa wan nebisilmanan nine.

Ev beşe ji akinciyên Îranê nek her weke hevwelatî nahên liberçavgirtin, belkî weke dujmin riftar bi wan re tê kirin û hemû civînên wan ji bo pêkanîna rê û resmên netewî, kultûrî û heta olî, li jêr çavdêriya tund û tûj a rejîmê de ne.

Kurdên nizîk ji 10 Milyon xulyaqet, piştî Fars û Turkan, sêyemîn beş ji xulyaqet û cuxrafiya Îranê pêktînin. Di heyamê desthilatdariya Komara Îslamî de pêtir ji 10 Hezar kes ji wan hatine kuştin û her niha bi sedan kes di girtîgehên rejîmê de ne ku nizîk ji 15 kes ji wan girtiyan hukmê lisêdaredanê bi ser wan de hatiye sepandin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê weke bitementirîn partiya Kurdistana Îranê, 66 sal e li dijî vê newekhevî û bêedaletiyê cehdê dike. Armanca partiya me ji vê xebatê, rizgarî ji çengên vê zulm û zoriyê ye ku derheq bi netewa me birêve diçe. Bo pêvajoya misogerkirina vê mebestê, em daxwaza Îranek demokratîk û federalî dikin. Di vê demê de ye ku Îran dibe a hemû Îraniyan, lê li hember vê daxwazê de jî xebatkarên me bi tometên "cudayîxwazî"ê tên girtin, îşkencekirin û îdamkirin, me wek partiyên Kurdî ên neyasayî didin nasîn û bi mebesta sepandina cezayên tund û tûj, me bi kirêgirtiyên derekî dihesibînin û heta bîr û bawera me bi şer li dijî Xwedê û Îslamê didin zanîn.

Eva di halekê de ye ku hikûmetê bi yasayên nedemokratîk û paremayî, xwe ji pirraniya akinciyên Îranê cuda kiriye û weke dujmin riftarê bi wan re dike, em dixwazin ku vê cudahî û stemê ji holê rakin û em hemû ji mafên vekhev xwedî derkevin.

Daxwazên han bi giştî daxwazên hemû van netewan in ku min di jor de bas jê kirin.

Bi armanca berhevkirina vê mebestê, sercem 15 partî û navendên kultûrî ên ser bi hemû van netewan, hevalbendiyek pêkanîne û li jêr navê "Kongireya Netewên Îrana Federal" û bi bernameyek hevbeş bi pêkanîna Îranek demokratîk û federal cehdê dikin.

Herweke stemkarî û binpêkirina mafê mirov li Îrana Komara Îslamî de bi awayê sazmandayî a îdeolojîkî birêve diçe, birêvebirina siyaseta navnetewî a rejîmê jî her bi wî awayî sazmandayî û îdeolojîkî ye, siyaseta han weke destêwerdan di kar û barên welatên devera Rojhilata Navîn, hevkarî bi taqimên terorîstî re, pêkanîna fitne û nearamî di wan welatane de û hewildan bo pêkanîna hikûmetên ji şîweya xwe, peydakirina desthilatê di wan hikûmetan de bi hemû nirxekê, weke erkê olî û yasayî yê vê hikûmetê hatiye diyarîkirin.

Ji bo perderakirin li ser siyaseta rastîn a derveye vê rejîmê, hewcehî bi hewl û xwemandîkirinê nine, yasaya bingehîn a vê rejîmê rohn û aşkera ye.

Yasaya han daxwaza serhildana şoreşan di nav xwe û derveyî sînorên Îranê dike û daxwaza "take civaka yekbûyî a bisilmanên cîhanê" dike ku ew jî di bin rikêbên xwe de be.

Hêzên ewlehî û eskerî ên vê rejîmê mafê yasayî bi wan hatiye dayîn, biryara han bi cih bînin ku ji pêşwaziya "Cehada Muqedes" "bo geşekirina desthilata yasaya xwedayî bi ser cîhanê de" re herin.

Ev siyaseta berteng, boçûna han eyan dike ku anîne holêye guhertinan di Îranê de bibê guherîna vê rejîmê çênabe, jiber ku hemû moreyên vê rejîmê siyaseta navxweyî û derve ya wan li gor yasaya bingehîn a rejîmê dadirêjin.

Berdewamiya hikûmetê li ser mehandina yuraniyomê bi armanca destpêragihîştin bi çeka navikî jî her diçe xaneya vê siyaseta giştî û bi mebesta gihîştin bi vê armancê jî amadeye hemû givaşek navnetewî pêtir ji ewa ku niha li ser heye, bipejirîne.

**Civaka navnetewî tevî Amerîkayê jî berpirsatî li ser milên wan e ku hevkarî û piştevaniya hêzên aşitîxwaz û demokrat ên Îranê bo guherîna rejîmê di Îranê de bikin, berî ku ji vê yekê direngtir bibe.**

Bi lênêrîna ji siyaseta han, niha rejîma Komara Îslamî di vê bawerê de ye û radigehîne ku guhertinên çend mehên derbasbûyî li welatên Bakûrê Afrîqa û devera Rojhilata Navîn weke Misr, Tûnis, Lîbî, Behrîn û ên din, dirêjiya şoreşa îslamî a sala 1979'a li Îranê ye.

Ji aliyekê ve rejîm dixwaze nearamiyê di welatên "neyar" pêkbîne, ji aliyek din ve jî netenê di pêwendî li gel tun û tûjî û tepeseriya dijberên xwe di nava welatê Sûriyê de bêdeng e, belkî belgeyên cihê baweriyê di ber dest de hene ku rejîma Îranê rasterast dest di tepeseriyên xwenîşanderên aştî û azadîxwaz ên nav Sûriyê de heye û dinyaya derve bo handana serhildanan li Sûriyê tawanbar dike.

Civaka navnetewî bi taybetî DYA, pêwîst e pêtir pêşî ji destêwerdanênên Tehranê di kar û barên deverê de bigrin.

Destêwerdanên han ne tenê bûne astengek li pêşiya azadî û demokrasiyê li Îranê, belkî li gişt herêmê reng ve daye.

Pêşîgirtin ji hêzên tepeserkar, wek Sipaha Pasdaran bo cezakirina binpêkerên maf û azadiyên xelkê Îranê hemû pêngavan dirust in.

Me berê jî pêşwazî ji wan cure pêngavan kiriye û li paşerojê jî berdewam dibin. Hin nîşane xuya ne ku siyasetvanên Amerîkayê ji rewşa kêmaniyên etnîkî û olî ên Îranê haydar bûne. Eva li axaftinên Maykil Poznêr, harîkarê Wezîra Derve ya Amerîkayê li pêş komîsyona Sinayê de dixuya.

Herweha Wezareta Derve a Amerîkayê nîgeraniya xwe li hember rapora ku çalakek Kurd di metirsiya mirinê de ye nîşan da. Amerîka nabe li hember givaşên li radebider ên li ser kêmaniyên etnîkî ên Îranê de bêdeng bimîne.

Herweha em pêşwaziyê ji gelaleya terxankirina îmkanatên zêdetir bo berhemanîna alavên mediya a nû ku hevkarî bi hevwelatiyan dike ku dengê wan bihê bihîstin, dikin. Dibe hevkarî bi xelkê me re hebe û bihên handan ku daxwaza azadiyê, rohnbûn û serweriya yasayê ji hikûmeta xwe bikin.

Ev destpêşxeriyane weke "yasaya girîngîdan bi demokrasî û mafê mirovan li Îranê, li 2011'an bi pêkhateşikêniya Sînator Mark Kîrik û çendîn endamên din ên Sinayê û Civata Nûneran li her du aliyan, cihê pêzanînê ye.

Lê em divê ji bîr nekin ku destpêşxerî û terxankirina îmkanatan, gerek awêneya pêkhateya civakî, zimanî, çendnetewî û olî a Îranê be ku bikare karayî hebe. Hêjayî bîranînê ye ku zimanê Farsî, zimanê axaftina tenê nîveya heşîmeta Îranê ye. Di encam de, bidestxistina wan alavan bi zimanên din û xelkên din, pêwîst e bo handan û bingehdanîna demokrasiyê li Îranê de.

Di dawiyê de dixwazim carek din pêdagirî li ser vê yekê bikim ku riya rizgariya xelkê Îranê tenê nemana vê rejîmê û avakirina hikûmetek demokratîk de ye ku bi xwasta azad a xelkê Îranê bihê hilbijartin.

Êdî nabe netewên Îranê bihên pişguhxistin. Civaka navnetewî tevî Amerîkayê jî berpirsatî li ser milên wan e ku hevkarî û piştevaniya hêzên aşitîxwaz û demokrat ên Îranê bo guherîna rejîmê di Îranê de bikin, berî ku ji vê yekê direngtir bibe. Dema ku hikûmeta nû pêktê, gerek awêneya cih û pêgeha biheq a netewên nava welat de be. Nexa destpêka her êrîş û gavekê dê li gel şikestê berbirû be.

**Gellek sipas bo amadebûna û guhdariya we**

# Konferansa neteweyî



Ebdulla Hicab

Pêwîstiya li hev hatina rêkxistin û partiyên siyasî ên Kurd ji bo avakirina sîwanek hevbeşe neteweyî, an her nebe danîna hin xalên bingehîn ji bo tevgera neteweiye Kurdistanê bi salane di rojevê de ye. Di salên dawî de hin hewl jî hatine dan ku her nebe zemîneya li hev hatinek bi wî rengî amade be, bêy ku serketinek berçav bi dest xistibe.

Daxuyaniya serokatiya Herêma Kurdistan di derbarê pêkanîna Konferansa Neteweyî di sala 2011'an de hêviyek nû da alîgir û xebatkarên riya yekîtiya neteweyî. Her çend pêkanîna îhtimaliye wê konferansê ne hemû astengên li ser riya têkoşîna gelê Kurd radike û ne jî bi serê xwe dikare yekîtiya neteweyî çê bike, lê ji xwe kombûna hemû aliyên xwedî bandor di tevgera neteweiye Kurdistanê de li dora hev pêgavek mezin e.

Pêdiviyên henokeye tevgera Kurd bi stratêjiya neteweyî û mijarên ku hemû hêz pêwîste li ser tifaqê bikin bi xwe basek sereke ye. Di wê çarçoveyê de hem pêştir nîqaş hebûne û hem di rojên pêşiya me de û heya dema pêkhatina konferansê wê dem û derfet hebin ku bas were vekirin. Weke serbasek ji bo vekirina riya basên pitir di wê çarçoveyê de, giringe ku mirov hinekê çarçoveyê fireh bike û bi çavek ji sînoran dûrbîntir temaşey mijara konferansa netewî ya Kurd bike.

Konferansa netewî ya Kurd ji bo gelên herêmê û welatên deselatdar bi ser Kurdistanê jî derfetek zêrîn e heya bikarin pirsgirêkên xwe çareser bikin û riya aştî û demokrasiyê bigirne pêşiya xwe. Eger pêwîstiya tevgera Kurdistanê bi danîna hin pîvan û çarçoveyên hevbeş heye ku ji bo partî, rêkxistin û xebatkarên tevgera neteweyî li hemû beşên Kurdistanê bibe çavkaniya biryarên stratêjîke netweyî, ji bo dewletên herêmê jî biryarên wê konferansê dikarê riya çareseriya pirsgirêkan veke. Pîvanên ku dikarin bibin xeta sor ji bo hêz û aliyên beşdar di tevgera Kurdistanê de, ji bo dewletan jî dikarin heman çarçove û sînoran diyar bikin.

Stratêjiyek weha di heman demê de ku dibe sîwana hevbeşe neteweyî bo gelê Kurdistanê û dikeve serveyî taktîkên têkoşîna neteweyî li gor mercên her yek ji welatên ku Kurd lê dijîn, çarçoveya çareserkirina pirsa Kurd jî diyar dike.

Gelê Kurd li warê siyasî ve dikare û pêwîste li gor mercên her perçeyê Kurdistanê projeya siyasiye xwe bi pêş bixe. Modela çareser kirina pirsa neteweyî di çarçoveya welatên federal de ji bo rewşa Îraq û Îranê pir munasibe û ji aliyê hêzên her yek ji wan beşên Kurdistanê ve hatiye pejirandin û li Îraqê kar pê tê kirin. Li Bakûr basî xweseriya demokratîk tê kirin û li Başûrê Rojava beşdarî di siyaseta welat de û nasîna nasnameya neteweyî weke armancên têkoşîna netweyî hatine ragehandin.

Hêzên serekeye Kurdistanê bawerî bi demokrasî, sekolarîzm, dabeşkirina deselata siyasî, demokrasiya herêmî û lîberalîsma siyasî hene. Hemû hêzên Kurdistanê amade ne di çarçoveya welatên ku lê dijîn de pirsa Kurd çareser bikin. Ew xalên hevbeş dikare bibe bingehek xurt ji bo damezirandina stratêjiyek hevbeşe neteweyî. Stratêjiyek wisan di heman demê de ku ji bo doza Kurd pêgavek ber bi pêş ve ye, ji bo pêvajoya demokrasî li herêma Rojhilata Navîn û demokratîze kirina sîstemên siyasiye herêmê jî pêgavek xurt e.

Stratêjiya hevbeşe Kurdistanî dikare bibe pira bi hev re girêdana 4 welatên ku di hemû dîroka xwe de bi hev re di nava netifaqî û şer u kêşeyan de bûne. Şerê Îran û Îraqê, dijberiya partiyên Beis li Îraq û Sûriye, gefên Turkiyê ji Sûriyeyê, destêwerdana Turkiyê li Îraqê, netifaqiyên di navbera Îran û Turkiyê de û hwd, bi tenê hin mînakên astengiyên li ser riya hevkariya di navbera wan welatan de ne. Li navbera sînorên fermiye hemû wan welatan de jî gelê Kurd dijî û coxrafiya Kurdistanê heye.

Wate di hemû şer û netifaqiyên navbera wan welatan de bi awayekê pirsa Kurd dikeve rojevê. Lê dema Kurd bi hev re yek bin û li ser bingeha wê li hevhatinê, ji pêvajoya demokrasiyê ji welatê xwe re jî bibin alîkar, wê demê li ciyê şer û ajawe û kêşeyan, wê aştî, li hev hatin û pêşveçûn bikeve rojevê.

Mînaka Yêkitiya Ewrûpa ezmûnek zindî û mezin e ku hem gelê Kurd û hem aliyên ku mafê kurdan binpê dikin dikarin weke modêlek siyasî faydê jê bibînin. Em ji bîr nekin ku netifaqî û şer û arîşeyên di navbera gelê Kurd û welatên serdest de çi gav negehîştiye asta kêşe û dijminkariyên di navbera welatên Ewrûpa de heya dema avakirina sazî û dezgehên hevbeşe ku rê ji bo ava kirina Yekîtiya Ewrûpa xweş kirin. Bi dehan salan Alman û Feranse dijminkarî û şerê hevûdin kirin, Ingilistan bi Alman re şerên mezin meşandin. Îtaliya di nava şer de bû. Welatên Benelux (Biljîk, Hulend û Luksemburg) hatibûn dagîr kirin, welatên bakûrê Ewrûpa bi caran hatin dest bi destkirin, lê di dawiyê de Ewrûpayî neçar man ji çareseriyek siyasî bigerin. Ew çareserî li hev hatinek siyasî bû ku li ser bingeha abûriyê hate damezirandin û di dawiyê de bû bingeh ji bo sîstema Ewrûpa ya îro.



Sala 1951 Feranse, Alman, Îtalia û welatên Benelux rêkevtinnameya Parîsê wajo kirin ku bû bingeh ji bo ava kirina "şirketa hevbeşe Rejî û Pola". Ev li hev hatin di heman demê de ku rêkevtinnameyek bazirganî bû, riya aştiyê jî xweş kir û bû bingeh ji bo pilanek stratêjîke aştiya Ewrûpayî. Sala 1957 heman 6 welatan biryarek nû dan û "Bazara Hevbeşe Ewrûpa" damezirandin. Piştî wê welatên din yên Ewrûpa yek li pey yekê bûne endam û deriyê xwe ji hev re vekirin.

Bi awayekê ku di her çar warên bazirganî, hatinûçûn û damezirîn, gera sermaye û damezirandina şirket û navendên kar û ticaretê de hemû hevwelatiyên Ewrûpa serbest in ku li ciyê ku bixwazin û karê wan hebe, cî bigrin.

Bazara Hevbeş a Ewrûpa sala 1992'an cewher û naveroka lihevhatinê guherî û derbasî yekîtiyek siyasî bû. Yekîtiya Ewrûpa îro ji 27 welatan pêk hatiye û dost û dijminên berê anîne bin yek sîwana hevbeşe siyasî de. Xeyalên ku beriya 60 salî ji her kes û aliyê siyasî re dûr û ne mumkîn bûn, di pêvajoyek çend salî de bû rastiyek bi bingeh ku bi dialog û pilan û pirojeyên siyasî dikare pirsgirêkan çareser bike û gelan û welatan bi hev re girê bide.

Rewşa îro ya Rojhilata Navîn û Kurdistanê heya dawî weha nameşe. Pêwîstiya pilanek stratêjîk ji bo guherîna rewşê û amadekirina zemîneya aştî û bi hevre jiyanê niha di rojevê de ye. Gelê Kurdistanê potanisiyela hindê heye ku bibe pira aştiya navbera welatên herêmê. Konferansa Netewî ya Kurd dikare pêngava yekê di wê riyê de be.

Lê ji bo ku konferansa neteweyî bandora xwe hebe û hêzên beşdar ji her perçeyê Kurdistanê bikarin di astek bilind de karîger bin, pêwîste pêştir tifaq û lihevhatin bê nav mala Kurd de û diyaloga neteweyî di navbera hemû aliyan de bi pêş bikeve.

## "G8" ji guhertinên demokratîk li Îranê de piştevaniyê dike

**Rêberên "G8"ê bûyerên wan dawiyane li Rojhilata Navîn de wek herifîna dîwarê Berlînê hesibandin, û ji guherînkariyên demokratîk li Îran û welatên Erebî de piştewanî kirin.**

Welatên pîşeyî ên cîhanê wate "G8" dixwazin ku bi piştevaniya xwe ya berfireh ji guherînkariyên siyasî û demokratîk li Misr û Tunisê vê pêvajoya demokratîzebûnê bileztir bikin.

Di daxuyaniya dawiyê ya civîna G8'ê de ku roja Înê 27'ê Gulanê bi dawî hat, bas ji dana wamek 20 milyard dolarî bi wan welatên ku têde guherînkarî rû didid hate kirin.

Rêberên welatên Misr û Tunisê jî bo vê civînê hatibûn vexwendin. Di daxuyaniya dawî a civîna G8'ê de herweha îşare bi tepeseriya bêrehmane ya rejîma Sûriyê jî hatibû kirin û daxwaz ji rejîma Sûriyê hatiye kirin ku desta ji tepeseriyê hilgire û tewaya girtiyên siyasî jî azad bike.

Herweha gef ji dewleta Sûriyê hatibû kirin ku ger dest ji tepeseriyê nekêşe, dê rêberên G8'ê riyek din li hemberî wan de bigirne pêşberî xwe.

## Mesûd Tek:

# AKP jî li van êrîşan de tawanbar e, ji ber ku nekariye pêşiya wan bigre, lewma ew jî li vê xwîn rijandinê de berpirsiyar e

**Hevpeyvîn: Selîm Zencîrî**



**Tirkiye niha li qunaxek hesas û dijwar a siyasî de ye, ji hêlekê ve guhertina hevkêşeyên siyasî li deverê de gefê ji wî welatî ku awisê gelek kêşe û guhertinan e, dixwe û ji hêla din ve jî hilbijartinek gelek girîng li pêşber de ye ku qirar e çend rojên din birêve biçe. Bo vê yekê jî part û aliyên siyasî ketine xwe û li rikeberiyê de ne bo bidestxistina korsiyên zêdetir. Li ser girîngiya vê hilbijartinê, rola partiya desthilatdar û siyaset û riftara wan li gel pirsên siyasî, pirsa kurd û herweha yekêtiya hêzên siyasî ên kurdî li vê hilbijartinê de me çend pirsiyar arasteyî hêja Mesûd Tek, Sekreterê Giştî ê Partiya Sosyalîst a kurdistanê kirin ku bi vî awayî bo me hate axavtinê.**

**Birêz Tek derheq girîngiya vê hilbijartinê wiha raya xwe anî ziman:**

Hilbijartina 12 Hezîranê ji ber du-sê xalên serekî girîng e. Yek ji wan ew e ku piştî hilbijartinê, amade kirina destûreka serdemî û nû wê bibe xala yekê ya rojeva siyasiya Tirkiyê. Destûra heyî, ku berhema kûdetayê 12'ê Îlona 1980'ê ya faşîst e, ne tenê nikare pirs û pirsgirêkên Tirkiyê yên siyasî û civakî çareser bike, her wusa bûye û dibe sedema gelek kêşe.

Demek dirêj e bi taybetî di proseya endametiya Yekêtiya Ewropayê de hin xalên Destûra Tirkiyê hatine guhertin. Lê belê ligel hindê jî nebûye dermanê derdan. Bûyer û pêşhatiyên dawî, bi taybetî veto kirina hinek berandamên serbixwe yên Kurd ji aliyê Dezgeya Bilind a Hilbijartinê(YSK) ve, nîşan dide ku destûra heyî bi pînekirinê ve nabîte destûreka serdemî. Bona vê yekê jî divê destûra nû bi gor prensîbên navnetewî were amade kirinê. Îro li Tirkiyê ji bilî hinek aliyên faşîst û leşkerparêz, hemû partî û aliyên siyasî behsa destûra nû dikin. Lê belê di proseya hilbijartinê da li ser destûrê bi giştî diaxivin, bi zelalî eşkere nakin ku destûreka çawa dixwazin.

Ji aliyê dinê jî amade kirina destûreka nû ne tenê karê Meclîsê ye, ku piştî hilbijartina 12'ê Hezîranê wê pêk were. Ji ber ku bo destûreka serdemî pêwîst e hemu çîn û pêkhatiyên civakî di amadekirina wê da beşdar bin. Lê belê rêjeya (baraja) sedî deh %10 nahêle ku nûnerê hemû çîn û pêkhatiyên siyasî, civakî, netewî û olî di Meclîsê da hebin. Ji bona vê yekê welatparêzên Kurd, hêzên aşitîxwaz, demokrat û dezgeyên sivîl ji bona destûreka nû, ku divê têda hebûn û maf û azadiyên hemû pêkhatiyên netewî û olî were misoger kirinê, bihevre kar û xebatê bikin.

Xaleka dinê ku piştî hilbijartinê dibîte xala serekî ya rojeva siyasiye Tirkiyê, pirsa Kurd e. Doza Kurd berhema siyaseta resmî a dewleta Tirk e, ku li ser înkar û asîmîle kirin û ji navbirina neteweyên ne tirk hatiye demezrandin û heya niha jî nehatiye çareser kirinê. Ji ber ku hikûmetên Tirkiyê siyaseta fermî ya dewletê birêva birine.

**Piştî du dewreyan ji serokatîkirina welat ji aliyê AKP'ê ve û dana soza çareseriya pirsa kurd, niha ew pirs li çi qonaxekê de ye?**

Bê guman hikûmeta Partiya Dad û Pêşveçûnê (AKP) di hinek waran da ciyawaz e ji hikûmetên berê xwe. Hikûmeta AK Partî û serokê wê Erdoxan îtîraf kirine, ku li Tirkiyê kêşeyê Kurd heye û bi demokratîze kirina welat ve tê çareser kirinê.

Divê bê gotin ku him di proseya endametiya di Yekîtiya Ewrûpa û him jî di proseya "vekirina demokratîk" da, AK P'ê hinek gavên baş avêtine, wekî televîzyona TRT-6 û vekirina beşên Kurdî di hinek zankoyên Tirkiyê da û serbest berdana bi karanîna zimanê Kurdî di çalakiyên siyasî de û hwd..

Guman têda nîne ku gavên hanê baş in û rê li ber çareser kirina pirsa Kurd xweş dikin, lê belê kêşeyê Kurd hinde mezin e ku bi du-sê gavên wusa nayê çareser kirinê û pêwîst e gavên din yên mezintir werin avêtinê. Lê, hikûmeta AKP ne tenê gavên din neavêtin, belkî paşgez bû.

**Çi bû sedem ku ew paşgez bin? Gelo em dikarin vê paşgezbûnê weke taktîk bona bidestxistina dengên zêdetir bihesibînin yan bo naveroka wan vedigere?**

Bi gor bîr û baweriya min sedema bingehîn a paşgez bûna Erdoxan û hikûmeta wî, naverok, bername û rêbaza wê partiyê ye. AKP ne partiyeka şoreşger e û tixûba demokrat bûna wê jî berteng e. Ne hinde berfîreh e ku em dixwazin. Her wusa AKP di xebata demokrasî û azadiyê de kêm tecrube ye, ji ber ku derbazbûyiya wê partiye di warê demokrasiyê de tu nîne, bingeha wê partiyê olî ye, ji partiyeka îslamî cuda bûye. Ji ber vê yekê jî em nikarin çavnihêr bin ku AKP heta dawiyê şoreşger û demokrat be.

Ligel vê yêkê jî deshilatdariya 8 salî a AKP'ê, partiya hanê guhartiye ku ew yeka jî tiştekî siruştî ye. Her partiyek wek AKP'ê were ser hikum û deshilatê bigre destê xwe, demokrat bûn û guhartinxwaziya vê partiyê sal bi sal kêm dibe, dibine astengek li pêşiya proseya demokrasî û peşkevtinê.

Bi gor bîr û baweriya min AKP hêşta negihîştiye vê qonaxê ku bi temamî bibe asteng li pêşiya demokrasî û guhartinê. Rast e hinek kar û kiryar û helwestên AKP'ê ne tenê xizmeta demokrasî, aşitî û guhertinê nakin, belkî dibine astengek.

Lê îro jî astenga herî mezin li pêşiya proseya aşitî û demokrasiyê, her dewleta Tirk û sîstema resmî ya dewletê ye û AKP jî nikare û nexwaze vê sîstemî bi temamî biherifîne û sîstemeka nû û serdemî ava bike. Ji ber vê yêkê jî di pêşerojê de divê em piştgiriya gavên AKP'ê, yên ku ber bi demokrasî û aşitiyê ve davêje bikin û zextê lê bikin ku gavên baş û maqultir bavêje.

**Carna em dibihîsin ku serokwezîr Erdoxan dibêje pirsa kurd nemaye û carna jî dibêje heye. Ev dufaqiye li siyaseta Erdoxan de hûn bo çi vedigerînin?**

Demek e Serokwezirê Tirkiyê, Erdoxan dibêje: "kêşeyê Kurd nemaye, me çareser kiriye, hinek kêşeyên hevwelatiyên Kurd yên civakî û aborî hene", ku ev yeka ne rast e. Ji ber ku hêj hebûna Kurdan û mafên Kurdan yên netewî nehatine nasîn. Bi gotineka dinê Kurd hêj jî ji mafên komî bêpar in û hikûmeta AKP'ê jî amade nîne mafê destecemî bo Kurdan binase û dixwaze bi nasîna mafê takekesî pirsa Kurd çareser bike. Ku bîr û bawerî û daxwaz û rêbaza hanê her wusa yê arteşa Tirk e jî. Çend sal berê Serokerkanê Tirkiyê gotibû ku "me mafên takekesî û çandî qebûl in, Kurd dikarin bi zimanê xwe biaxivin, bînîvisin, stranên xwe bibêjin, çanda xwe pêşve bibin, lê belê em rê nadin bo mafên destecemî û komî. Bi vê çendê jî xuya dibe ku ertêşa Tirk û Hikûmeta AKP'ê li ser çareser kirina pirsa Kurdî bi nasîna mafên takekesî lihev hatine.

Ez ne dijî nasîna mafên takekesî me, lê belê pirsa Kurd bi vê rêyê ve nayê çareser kirinê û divê nasîna mafên destecemî jî ligel de be. Bê guman nasîna mafên takekesî û kûrtir kirina proseya demokrasiyê rewşa siyasî aramtir dike û bi vî awayî rê li ber çareser kirina pirsa Kurd vedibe.

**Serbarê agirbenda yekalî a PKK'ê, lê niha jî operasiyonên leşkirî û siyasî li dijî kurdan dimeşin. Gelo ew yeka niyet û semîmiyeta wan a çareseriyê nabe bin pirsiyarê? Yan jî gelek kes li ser vê baweriyê ne ku AKP dixwaze siyaseta xwe ya piştî hilbijartinê bo êrîşek berfirehtir dabirêje. Raya we?**

Wek tê zanîn PKK'ê heya 15'ê Hezîranê agirbes ragihandiye û gotiye ku carenivîsa agirbesê di destê desthilata Tirkiyê da ye, eger desthilata Tirkiyê nîşan bide ku bi rastî dixwaze doza Kurd çareser bike û di wî warî de semîmî ye, agirbes berdewam dibe.

Lê, li Tirkiyê hinek hêz û aliyên siyasî û rêxistin û dezgehên dewletê hene ku naxwazin demokrasî û aşitî li Tirkiyê de cîgir be, pirsa Kurd were çareser kirinê (ertêşa Tirk û general ji wan hêzan in). Hêzên hanê aşitî û aramiyê naxwazin û dixwazin rewşa siyasiya Tirkiyê aloz û tevlihev be, daku daxwazên xwe yên kirêt bidest bixin. Ji bo vê armancê jî fitne û ajaveyan digerînin.

Divê bêjin ku dewleta kûr a Tirk jî di vî warî da zana, pispor û xwedî tecrube ye û di nava Kurdan da jî hinek kes û alî hene ku ew ji naxwazin aşitî û demokrasî cihgîr be.

Armanca operasyona dawî ya erteşa Tirk aloztirkirina rewşa siyasiya Tirkiyê ye. Bi wan operasyonan dixwazin li Tirkiyê tevlihevî hebe, şer û pêvçûn, tund û tûjî pirtir be, daku bikarin pêşiya hilbijartinê bigrin. Ez ne ligel vê hizr û ramanê me ku dibêjin operasyonên leşkerî bi qezanca AKP'ê ye. Bi raya min berevajiya wê rast e. Alozî her wusa bi zirara AKP'ê ye jî. Lê AKP di van oparasyonên leşkerî de bêtawan nîne. Ji ber ku nekariye pêşiya operasyonan bigre, lewma ew jî yek ji berpirsên xwînrijandiyê ye.

**Niha em dibînin ku bi awayekê hevahengî û yekêtiyek li navbera hêzên siyasî yên kurd li bakûr de pêk hatiye. Hûn vê gavê çiqas girîng dibînin û ew çiqas dikare rê li ber yekêtiya netewî li bakûr de xweş bike?**

Bêguman bandora yekdengî û yekhewestiya hinek partiyên Kurd li ser hilbijartinê wê erênî be. Ne tenê di warê zêdekirina kursiyên Kurdan di Meclîse de, herweha di proseya nû da, ku piştî hilbijartinê wê destpê bike. Bo minûme di proseya amadekirina destûra nû, proseya pêşvebirina xebata aşitî û demokrasiyê, di proseya bidest xistina mafên demokratîk û netewî de û hwd...

Em dizanin ku tevgera azadiya Kurdistanê hêzeke bi bandor e di proseya demokrasî û guhartinan li Tirkiyê de. Eger hêz û aliyên siyasî yên Kurd li ser daxwazên hevbeş yekdeng û yekhelwest bin, tevgera azadîxwaza Kurdistanê jî bi hêztir dibe. Tevgera azadîxwaziya Kurd ya bihêz jî ne tenê bi qazanca me ye, belkî li berjewendiyahezên aşitîxwaz û demokratên Tirkiyê de ye jî. Herweha



www.arsivakurd.org

# Heqîqet heya dawiyê veşartî namîne




**Senar Hatemî- Swîs**

Êrîşa ser nawendên bazerganî û nîzamî yên Amerîkayê bûyerek girîng, bijan û li heman hal de yekalîker ji bo Amerîka, cîhan û pêwendiyên navnetewî bû. Ew kiryara terorîstî, destpêka qonaxek nû li dîroka Amerîka û cîhanê de bû û dawî bi zehniyeta cîhana yekcemserî anî ku piştî hiloşîna bilûka sosyalîstî, sermestê serketina xwe mabû. Lê wê bûyerê xerîteya siyasî a cîhanê guherî û Elqaîde jî bûye mîmarê parvekirina cîhanê bi ser du eniyên teror û ya li dijî terorê de.

Niha piştî borîna dehsalekê bi ser bûyera tirajîdîk û xembar a terorîstî ya 11'ê septambera 2001'ê li Amerîkayê de, ku bûye sedema mirina 3000 kesan û hiloşîna du hikûmetên weke ya Talîbanan li Efxanistanê û Rejîma Beis li Îraqê û kuştina Bin Ladenê darêjerê wê pîlanê li pey xwe re anî, hêj şerê bi dijî terorê bidawî nebûye û her ku diçe tiştên nû û dest û tiliyên nûtir di wê pîlanê de eşkere dibin, ku yek ji wan jî Komara Îslamî a Îranê ye.
Her çend ku wê demê jî nerasterast îşare bi rola Komara Îslamî li hevkarîkirina terorê de dihat kirinê û Serkomarê wê demê yê Amerîkayê Bûş jî, Komara Îslamî weke mîhwer û hêla şerotiyê binav kir û ji wê demê ve heya niha bi caran dewsa Komara Îslamî li kiryarên terorîstî de diyar bûye û weke piştewanê terorê hatiye mehkûm û şermezar kirin.
Lê niha belgeyên nû kivş bûne ku Komara Îslamî a Îranê û girûpa kopalbideste xwe(Hizbula), serbarê haydarbûn ji pîlana encamdana wê cinayet û kiryara terorîstî, bi xwe jî dest têde hebûne. Li vê derheqê de dadgehek li Amerîkayê de gorî şahidî û gewahyariya sê kesan ku berê bi xwe ji berpirsiyarên payebilind yên ewlekariya rejîma Îranê bûne, dide eyanê ku rejîma Îranê jî rol li wê bûyerê de hebûye. Pêka zaniyariyên wê dadgehê, rejîma Îranê li perwerde û veguhastina terorîstên êrîşa 11'ê Septamberê de rolek berçav lîstiye û herweha piştî bûyerê jî di hevkarîkirin û alîkarîgihandin bi rêxistina terorîstî a Elqaîdeyê de çalak û ektîv bûye.

Herweha piştî hiloşandina rejîma Talîban ji aliyê Amerîka û hevalbendan ve jî, rejîma Îranê bi sedan endamên Elqaîdeyê û bi taybetî endamên malbata Bin Laden û mezine berpirsên din li xaka xwe de pena û cih daye; yan jî riya helatina wan ji destê Amerîkiyan ve bo welatên din misoger kiriye.
Gorî wan zanyariyan Komara Îslamî û Hizbulahê ji sala 1990'î ve hevkarî û pêwendiyên xurt bi Elqaîde re hebûne û xwe ji çi alîkarî û piştewaniyek madî, menewî û perwerdeyî ji wan re neparastiye û man û bihêziya xwe li domandina wê siyasetê û xurtkirina eniya terorê de dîtiye. Lê gelo heta kengê dikare vê şop û rêbazê bigre ber xwe?
Bi vê dosyayê jî, riswayî û şermezariyek din bi karnameya reş û tejî tawan û teror a Komara Îslamî a Îranê zêde dibe. Lewma êdî pêwîste civaka cîhanî û bi taybet rojava li hember rejîma terorîstî û terorîstperwer a Komara Îslamî de çi din bêdeng nemînin û rol û nexşe wê li xurtkirina eniya terorê û herweha xeterî û gefa wê li ser ewlehiya cîhanê bi kêm nezanin. Êdî dem hatiye ku helwestek micid û rijd li dor makeya terorîzma navnetewî Komara Îslamî bidin pêşberî xwe da ku rejîma Îranê jî bizanibe ku roj heta dawiyê li pişt evran de nabe û heqîqet jî veşartî namîne.




# Rejîma Îranê rûyê serdemê reş yê desthiladrariyê Kilîsayan sipî kiriye



**Dara Natiq**

Civaka pêşkevtinxwaz û mafxwaz a xelkê Îranê bi giştî û bi taybetî netewên bindest yên welatê me, heyamê zêdetir ji sê dehik ji deshilatdariya Komara Îslamî a Îranê ye ku rojane şahidê zext û givaş, girtin, kuştin û îdamkirina xortên azadîxwaz yên xwe ne.
Destbiser kirin û nemaze darvekirina xurtên welatê me, weke siyasetek bingehîn û sîstematîk a vê rejîmê, di heyamê çend salên derbasbûyî, bi taybetî piştî ragehandina encama gera deyemîn a serkomariyê di Îranê de û berfirehtir bûna şîpela meşên bilome bi dijî rejîmê, pêvajoyek bileztir bi xwe ve girtiye.
Bi avayek ku li gor rapora Saziya Lêborîna Navneteweyî, Dezgeha Dadwerî a Komara Îslamî a Îranê di sala 2010'an de, berêvebirina cizayê darvekirina 252 kesî piştrast kirye, eva di demekê de ye ku rêkxistinên cîhanî ên mafê mirov, li ser vê baweriyê ne ku serjimêriya darvekirinê di Îranê de, ji vê yekê zêdetir e û rejîm ji bo xapandina raya giştî tu carî amara rastîn a îdaman eşkere nake û hukmê îdama piraniya wan kesan jî bi avayek veşartî tê cî bi cîkirin.

Pêka nûçegehaniya Feranseyê ku di heyva derbasbûyî de hat veşandin, tenê di çar heyvên destpêka sala 2011'an de, 143 kes li girtîgehên Komara Îslamî de, hatine Îdam kirin. Ji aliyek din ve, Ebas Ceferî Duletabadî, Serdozgerê Giştî û Şorişa Tehranê, di şend rojên derbasbûyî de, anku 8'ê Cozerdanê, di dema axaftina xwe a di rê û resmek taybet di Dadgeha Şoreşa Îslamî de, ragehand ku, di dema niha de zêdetir ji 300 kes li girtîgehên Komara Îslamî a Îranê de, çavnihêrê rêveçûna cizayê îdamê ne.
Şêvra Mafê Mirovan a Saziya Netevên Yekbûyî, di destpêka sala nû a zayînî de, carek din di biryarnameyekê de Komara Îslamî bi binpêkerê sereke yê mafê mirov da zanîn û ew yek şermezar kir. Her li gor rapora saziyên navneteweyî yên mafê mirovan, Îran piştî Çînê zortirîn hejmara îdaman birêve birye û duyemîn welatê cîhanê di warê îdamkirinê de tê hesibandin.
Ya ku cihê helweste û baldanê ye ew ku, birêveçûna piraniya wan hukmane bi ser netewên bindest û nemaze neteva Kurd de birêve diçin.
Rejîma Îslamî a Îranê di doma pêvajoya tepeserkirin, zext û givaş, û tund û tûjî bi ser neteweyan de, bi avayek hovane û bi hecetên cur bi cur xortên welatê me û bi taybetî xelkê mafxwaz yê kurd di Kurdistana Îranê de, destbiser dike û di dadgehên nîzamî û neadilane û çend deqeyî de, bi sûçên madeyên hişber yan xebat bi dijî tenahiya neteveyî û... cizayê darvekirinê bi ser wan de disepîne.

Bê şik herwek ji tev aliyekî re rohn û eşkere ye ku rejîm dixwaze bi girtin, kuştin, û îdam kirina xortên netevên bindest û nemaze xurtên kurd, revş û zirûfek bi tirs û xof li seranserî Îranê û bi taybetî herêmên bindes çê bike û hêz û îradeya tevgera mafxwaz a seranserî Îranê û nemaze ev şîpelên bi lomeye xelkê ku di heyamê çend heyvên derbasbûyî de di bajarên Ehwaz û kurdistanê xurtir bûye, û bûye cihê nigeranî û perîşanbûna rejîmê, lawaz bike.



**doma R: 5**
proseya aşitî û demokrasiyê pêşve dibe.
Xala girîng ew e ku yekîtiya hêzên Kurdî li Bakûr, ne tenê li ser hilbijartinê ye, belkî Partiyên ku ew yekîtiya hanê pêkanîne(HAK-PAR, BDP û KADEP), di nava xwe de jî Protokolek 7 xalî îmza kirine. Naverok û armanca protokola hanê tenê li ser hilbijartinê nîne, belkî li ser proseya piştî hilbijartinê ye.

Bi gor bîr û baweriya min eger protokola hanê nebe gorî û qurbana berjewendiya teng ên hizbayetiyê û ew aliyên siyasî ku têda cî girtine, bona cîbicî kirina protokolê dilsoz û samîmî bin, dikarin bibin bingehek ji bona tifaq û yekitiya netewî li Kurdistana Bakûr de.

Ji bona vê armancê jî divê bingeha protokolê bi beşdarbûna hêzên din yên welatparêz bihê berfireh kirin û hinek daxwazên netewî jî li ser daxwazan werin zêde kirinê. Ku ev yeka jî bi dan û standinên dilsozane pêk tê.

www.arsivakurdi.org

# UNICEF: 30 zarok li Sûriye hatine kuştin

**Saziya alîkariya zarokan a NY (UNICEF), da xuyakirin ku di encama tepeserkirina xwepêşandanên li dijî rejîma sûrî de bi kêmî 30 zarok hatine kuştin.**

Herweha hejmara zarokên rastî girtin, îşkence, koçberî û kuştinê tên, li Sûriye zêde dibe.

**Hêzên Sûriyê Îna Zarokan jî kirin gola xwînê!**

Bi navê Îna Zarokan, gelên Sûrî li gelek bajaran derketin xwepêşandana û daxwaza hiloşîna rejîmê kirin. Lê mixabin rejîma Sûriyê dîsan nerazîbûna îna zarokan li nav xwînê de hişt û bi kêmî 67 kes kuştin û zêdeyî 150î kesî jî birîndar kirin.



**Tirk li Sûriyê herêma tampon ava dikin**

Rojnamevanê Brîtanî û pisporê Rojhilata Navîn Robert Fîsk di nîvîsa xwe de ku di rojnameya Independetê de belav kiriye dibêje: ''Enqere jiber ku Esed gelekî derev lêkirine, aciz bûye û di egera şerê navxweyî de ji bo pêşîgirtina penaberan dixwaze bikeve Sûriyê û plana avakirina herêmek tampon dike.''Tirk, ji wê yekê ditirsin ku çawa piştî şerê Kendavê yê sala 1991ê Kurdên Îraqê koçber bûn, dîsan tiştekî wiha biqewime. Tirk dixwazin bo kesên ku ji Sûriyê seba qetlîaman direvin, di nav welatên wan de herêmeke cihê baweriyê çêbike. Artêşa Tirk wiha plan dike ji Qamîşlo bikeve Sûriyê û ber bi Dêra Zorê here û bi awayê Bakurê Rojhilat jî li xwe bigre herêmeke tampon dirûst bike.''

**Civîna Antalyayê: Kurd li Sûriyeyê gelê duyê ne**

Civîna "Mixalefeta Sûriyê ya bi navê "Konferansa Guhertinên li Sûriyê"ku di 1'ê hezîranê de destpêkir, piştî du rojan dawî bi karê xwe anî. Ji kurdan kesên wek Selah Bedreddîn û Şêx Murşîdê kurê Şêx Maşûqê Xeznawî jî di civînê de hebûn. lê 12 partiyên siyasî ên kurd kongireya Antaliyayê baykot kirin.

Armanca vê kongireyê ew bû ku nexşeriyekê ji bo guhertinên Sûriyeyê yên bi riyeka aştiyane peyda bikin. Gorî ajansan di daxuyaniya dawiyê de navê kurdan piştî ereban, di rêza duyê de hat diyarkirin.

Di encama civînê de komîteyek 31 kesî ji netewan pêkhatî, hat hilbijartin. Di daxuyaniya dawiyê de ji cîhana erebî û Rojava hat xwestin ku midaxeleyî binpêkirina mafên însanî yên li Sûriyeyê bikin. Wekî din civînê daxwaza pêkanîna hilbijartinên giştî yên azad û destûreka nuh, demokrasiyeka sivîl û redkirina midaxeleyên eskerî kir. Daxwaza rejîmeka sekuler (ilmanî) jî di civînê de hat kirin lê ji ber giraniya Exwanê Muslîmîn di daxuyaniyê de vê cih negirt.

**Rojev**

# Gelo çi yasayek dikare çavên "Aminê" jêre vegerîne!



**Şehab xalidî**

Li 10'ê Desambera sala 1948'an de bû ku NY karî pêngavek gellek girîng di warê xizmeta bi mirovahiyê hilgire ku ew jî pesendkirina ragehandrawa cîhaniya mafê mirovan bû. Ew ragehandin di warê hiqûqî ve ragehandrawek e ku biryara dawiyê nade, belkû pêşniyarê bi dewletan dike ku mafê mirov berçav bigrin.

Li Desambera sala 1966'an de paymana "Mafên abûrî-civakî û çandî" û peymana "Mafên medenî û siyasî" ji aliyê kora giştî ya NY ve hate pesendkirin ku di rastî de wek şoreşekê di warê mafê mirovan de bû. Piştî vê jî çendîn konvansiyonên navnetewî ên mafê mirovan pêk hatin, ku yek ji wan konvansiyona berberekaniya di gel eşkence û cezakirina tund û dijî mirovî bû ku li sala 1969'an de hate pesendkirin.

Serbarê van konvansiyonên cîhanî bo piştevanî û parastina mafê mirovan, konvansiyonên herêmî hatin avakirin bona vê ku çavaniya parastina mafê mirovan ji aliyê deshelatdatran ve bi awayê herî baş bikeve jêr çavdêriyê.

Konvansiyona Ewrûpayî ya mafê mirovan di sala 1950'î de hate avakirin, konvansiyona Amrîkayî ya mafê mirovan di sala 1969'an û konvansiyona Afrîqayî ya mafê mirovan sala 1981'an hate avakirin.

Welatên Îslamî ên endam li rêkxirawa Konferansa Îslamî de jî li sala 1990'î de "Daxûyaniya mafê mirovan a Îslamî" li bajarê Qahîrê de wajo kirin.

Îran yek ji wan welatan e ku konvansiyona navnetewî ya mafê mirovan wajo kiriye, lê mixabin bixwe tu yek j bendên vê cîbicî nake û li sedsala bîstûyekê de hukmên herî paremayî yên wek kevirbaran, birîna endamên leşê tawanbar, derxistina çav û bidarvekirinê û ... birêve dibe.

Rayedarên rejîma Îranê ku ola Îslamê kirine emraz bo gihîştina bi armancên xwe û bi navê ola Îslamê hukmên gellek tund û nemirovî bi ser bendiyan de disepînin û bi vî awayî Îslamê li ber çavê xelkê kirêt dikin, dibêjin ku welatên rojawayî dixwazin yasayên dijî Îslamî ên xwe bi zorê bi ser me de bisepînin. Eva jî dijî behayên netewî, olî û kulturî ên me ne.

Sadiq Larîcanî berpirsê dezgeha dadweriya rejîma Îranê di vê derheqî de dibêje ku : "Em konvansiyonên navnetewî ên mafê mirovan qebûl nakin û bi fermî nas nakin. Îro ên ku xwe wek alahilgirê mafê mairovan dihesibînin û dixazin bi zalbûnana bi ser welatên zulmlêkirî de li jêr perdeya xebata dijî terorîzmê kesên bê tawan ji nav bibin, dasepandina mafê mirovan a rojawayî û bi cîhanîkirina vê ji aliyê me ve nahê qebûlkirin".

Binpêkirina mafê mirovan ji aliyê deshelatdarên zal bi ser welatê me de hekî heya niha tenê xwe di çarçoweya birîna endamên leş, kevirbaran, û bidarvekirin û ... de didît, niha biryar e ku li se daxawaza dadgeha dûr ji dadperewerî û pirr ji cînayeta rejîma Îranê ve bo yekem car qesas bi awayê nû wate " çav li hember çav" de birêve here. Berpirsên dezgeha dadweriya rejîma Îranê biryar dane ku tawanbarê dosyeya "Dakirina têzavê bi ser û çavê Aminê" de li gorî yasaya cezayên Îslamî bihê qesaskirin, wate ew keça jî çavê tawanbar bi têzavê kore bike.

Hukmê qesasê biryar bû ku li 24'ê Banemerê birêve here, lê ew hukm bo demek nediyar hate paşvexistin. Biryara paşvexistina hukmê qesasê li demekê de hate dan ku Aminê Behramî digel malbata xwe dixwastin ku li cihê birêveçûna hukmê qesasê de amade bin.

Amine Behramî di gotûbêjekê de bi "DW" (Duyçê Wilê) re, derbarê biryara dadgehê di warê cîbicîkirina hukmê qesasa çav li hemberî çav de dibêje: "Ez dixwazim ku vî hukmî ne bo xwe, belkû ji bo îslahkirina civakê cîbicî bikim, lewra min daxwaza qesasê kir, jiber ku tawanbar gote min ku dê min bidar vekin û ezê rihet û asûde bim. Lê ez dixwazim ku ew bizane jiber ku ez berdwam azarê dibînim, ew jî divêt azarê bibîne".

Di rastî de jinavbirina ciwanî, jiyan, hêvî û xwaziyên keçek wek Aminê Behramî ji aliyê kesekî ve ku Aminê bersiva erênî nedayê, hest û şiura hemû mirovek xwedî vijdan birîndar kir û di nav civaka Îranê û heta cîhanê de jî bû cihê behs û gengeşeya di navbera neyarên birêveçûna hukmê qesasê û ên ku daxwaza birêveçûna hukmê qesasê dikirin.

Dijberên birêveçûna hukmê qesasê li ser vê baweriyê ne ku cuda ji vê ku ew hukm çende paşvemayiyane û li gorî sedsalên navîn e, û nikarê pêşiya bûyerên bi vî awayî bigre, belkû tenê dibe sebebê vê ku kêmendamek din bi kêmendamên di nava civakê de zêde be. Herweha hukmê qesasê taze ne çavên Aminê û ne jî ciwaniya Aminê navegerîne.

Herçend ku tu kes nikare xwe di ciyê Aminê de danê û bi êş û janên cesteyî û derûnê ên wê re bijî, û ew li ser vê bawerê ye ku tenê tolhildan wate cîbicîkirina hukmê qesasê ye ku dikarê dilê wê rihet û hêsayî bike, lê di rastî de Amine dikare bi poşmanbûna ji cîbicîkirina hukmê qesasê hem bersivek nerênî bide dezgeha bi nav dadwerî, lê pirr ji ferq û cudahî, û binpêkirina kerameta mirovan, û ji aliyek din ve bibe sembol ji bo hemû wan kesên ku dixwazin bi lêborînê meznahiya xwe, û hêz û şiyana xwe nîşan bidin.





www.arsivakurd.org

# Beşar bê guneh e, şaşitî ya hêzên ewlekariyê ye!

**Rûken**

Herçend ku Sûriyê li wan çend salan de hewlekî zaf da ku li sînorê wan û Îsraîlê de ewlehiyek tewaw hebe, û heta ji bo carek din bidestveanîna bilindahiyên Colanê (Gulan)'ê hewil neda, û dewleta Obama jî, ji dema ku hate ser kar gellek hewl da ku bi sedema giringiya Sûriyê di warê alîkariya bi wan re bo pêkanîna aştiyê li Rojhilata Navîn, û cîgirkirina ewlehiya di Îraê de, nêzî vî welatî be, lewra pêwendiya Amerîka û Îsraîlê bi Sûriyê re heya vê daviyê pêwendiya ne şer-ne aştî bû.

Lê niha cînayetên rejîma Sûriyê gihîştine astekê ku êdî Amerîkayê helwêstek mirovdostane girt û bi şermezarkirina rejîma Beşar Esed û biryara tehrîman bi dijî rejîma Sûriyê, karî pêşiya rexneyên azadîxazan û berevankarên mafê mirovan bigre, bi taybetî di vî warî de ku biryar da her du fermandeyên paye bilind ên rejîma Îranê jî bixe rîzbenda tehrîman de.

Serkomarê Amerîkayê di axavtinek xwe de, ragehand ku kar û kiryarên Sûriyê û siyasetên wê ên niha tehlûkeyek berdewam in, bo ser ewlehiya neteweî, siyaseta derekî û abûriya Amerîkayê. Obama berî vê îşare bi destêwerdana Îranê jî di nava karûbarên Sûriyê û desthebûna di tepeseriya meşên nerazîbûnê li Sûriyê de kiribû.

Rejîma Îranê hikûmeta Sûriyê wek hevpeymanê xwe bi taybetî di warê alîkariya bi Hizbullah û Hemasê re dihesibîne û jinavçûna wê jî bi zirara xwe dizane, lewra tewaya hewla xwe bi kar tîne ku bi kuştina xelkê Sûriyê jî be, deshilata Beşar Eesed ji navçûnê biparêze.

Ji aliyek din ve YE'ê bi derkirina daxûyaniyekê ragehand ku ew êdî sîlahan naşînin Sûriyê, jiber ku ew sîlah bona tepeseriya meşvanan tên bi karanîn.

Herweha di daxûyaniya xwe de ragehand ku ew vîzayê nadin berpirsên Sûrî û wê dest bi ser darayiyên 13 berpirsên Sûrî de bigirin.

piştî vê ku tehrîm ji aliyê YE û Amerîkayê ve bi ser Sûriyê de hatin sepandin, dewleta Kanada jî pêwendiyên xwe ên bazerganî bi Sûriyê re qut kirin. Radeya danûsitandinên tîcarî ên di navbera Kanada û Sûriyê salê 66 mîlyon dolar hatiaye texmîn kirin.

serbarê wan hemû cînayatên hovane, Beşar Esed rojekê ragehand ku li şêweya reftara bi meşvanan re hinek şaşî hebûne û heta bikaranîna hêza leşkerî jî, wê bihê sekinandin.

Serbarê vê axavtinan Beşar Esed ku di rastî de hovîtiya wî nîşan dide û bêhurmetiyek tewaw bi canê her mirovekî ye ku li ser vî xakî dijî, lê heya niha jî tepeserî berdewam e.

Hovîtiyek din ya Beşar Esed û rejîma wî ew bû ku hêzên Ewlekariyê ên Sûriyê, termê girûpek ji qurbaniyên nearamiyên wan dawiyane bi kantînêran birin û piştre avêtin nava behra Medîterane de. Li gorî hinek zanyariyan, ew kantînêr jî bi riya gemiyan ve bo nav behrê hatin birin.

Saziya alîkariya zarokan a NY (UNICEF)'ê jî roja sêşemiyê 31'ê meha May da xûyakirin ku di encama tepeserkirina meşên bi dijî rejîma Sûriyê de, bi kêmî 30 zarok hatine kuştin.

Herweha li gorî raporan hejmara zarokên rastî girtin, îşkencekirin, koçberî û kuştinê tên li Sûriye zêde dibin. UNICF dibêje, cihê mixabiniyê ye ku ew nikarin lêkolîneke bêlayen derbarê hejmara zarokên kuştî û şêweyê kuştina wan pêk bînin.

Ji hêleke din ve navê roja Înê 3'ê Juenê wek "Îna zarokên azadiyê"hate binav kirin, û "Civata Giştî ya Tevgerên Ciwanên Kurd" li Qamîşlo jî daxwaz ji meşvanan kir ku ji bo şermezarkirina kiryarên rejîma Sûriyê dest bi meşên berfireh bikin.

lewra Di çarçoveya xwepêşandanên ku li roja Înê, li seranserî Sûriye de birêve çûn, hate ragihandin ku li bajarê Şamê û derdora wê meşvan bi druşmên dijî serokê sûrî û rejîma wî derketin kolanan. Xelkên Helebê jî dengê xwe tevî bajarên din kirin û doza azadiyê û rûxandina rejîma Sûriyê kirin.

hêzên ewlekariyê li herêma bi navê Laziqiyê de jî, hejmarek mezin xwepêşander giritn, cihê ku berî niha jî girtî li vir hatin îşkencekirin.

Li Qamîşlo, Amûdê, û Kobanê de jî, bi hezaran kesî meş li darxistin. Ji aliyekî din ve, dema ku li deverên Şam, Himsê û çend bajarên din yên ku Ereb lê dijîn, bi deh hezaran xelk kom bûn, hêzên Sûriyê bajarê Hemayê kirin gola xwînê. Hêzên Sûriyê li bajarê Hemayê xelk dane ber gulleyan. Heta niha li gor daxûyaniyên kanal û çavdêrên mafê mirovan 67 kuştî li bajarê Hemayê hene. Her wiha, di van her du rojan de jî, di encama topbarana hêzên Sûriyê, çavdêrên mafê mirovan ragihand ku jimara kuştiyan gihişte 66 kesan.

ji aliyek din ve kongira rikberiya sûrî ya ku li bajarê Entalya de pêk hatibû, bi dawî bû. Di daxûyaniya vê kongireyê de hêzên rikber piştevaniya xwe ji şoreşa xelkê Sûriyê û misogerkirina mafê hemû pêkhatiyên Sûriye di makzagonê de ragehandin. Herweha daxwaz ji Esed kirin da ku dest ji kar berde û desthilatê bide dest nûnerê xwe ta ku hilbijartinên perlemanî û yên serokatiyê pêk bên.

Di kongirê de komîteke şêwirdariyê hate hilbijartin ku çar kes ser bi "Îxwanê", çar Kurd, çar kes ser bi "Ragihandina şamê", û çar kes jî ser bi "Êl"an bûn. Herweha di hundirê kongirê de hejmarek kurd û Ereb hevbendiyeke bi navê "Hêzên Sikular ên Sûrî" damezrandin.

Weha xûya ye ku rejîma Beşar Esed jî wek bavê xwe dixwaze li Sûriyê de bi çêkirina hemama xwînê deshilata xwe ya lerzok biparêze, lê niha di serdemê hişyarbûna gelan bi taybetî di warê azadî û demokrasiyê de, û di serdemê bi cîhanîbûnê de ku tu rejîmek mirovkuj nikare cînayetên xwe veşêre, gellek zehmet e ku xelkê Sûriyê desta ji xebata xwe ya pîroz bo gihîştina bi azadiyê û rizgarbûna ji destê sitemkarekî wek Beşar Esed hilgirin.



# Dîplomatê Îranî li Misrê hat derxistin

## Misr: Wî hevkariya malî bi girûpên siyasî ên Misrê re dikir

**Berpirsyarên dewleta Mîsrê ragehandin ku ew dîplomatê Îranî ku ji Mîsrê de hate derkirin, ji aliyê dozgeriya Mîsrê ve bi vê yekê hate tawanbarkirin ku bi hevkarîkirina malî di gel girupên siyasî ên Mîsrê, dixwast ku wan girûpan bike alîgirê rejîma Îranê.**

Li gorî rapora rojnameya "Eşerqul Ewset", girtin û lêpirsîna ji vî dîplomatî berî vê bû ku posta wê ya dîplomatîk bihê



eşkerekirin.

Eva jî di demekê de bû ku berpirsyarekî nivîsîngeha parêzerê qazanc û berjewendiyên Îranê di bersiva bi nûçegihaniya "Eşerqul Ewset" de ragehand ku ew kesê ku ragehandinên giştî wek dîplomat bas dikin, kesekî asayî ye û dîplomat nine.

Pêwendiya di navebra Îran û Mîsrê de piştî şoreşa sala 1979'an li Îranê bi sedema wajokirina peyman aştiya di navbera Mîsr û Îsraîlê de, û herweha danîna navê bikujê Enwer Sadat li ser şeqamekî Tehranê qut bû, lê her du welatan li Tehran û Qahîreyê de nivîsîngehên parêzerê qazanc û berjewendiyan hene.

Rojnameya "Eşerqul Ewset", çend rojan berî niha îşare bi vê hindê kir ku berpirsyarên rejîma Îranê hatine ser vê bawerê ku navê şeqama Xaild Îslambolî rakin û bikne şeqama " Şehîdên şoreşa Mîsrê".

Xalid Îslambolî efserekî Misrî û endamê girupa "Cîhada Îslamî" bû ku bi çend kes ji hevbîrên xwe re li roja 6'ê Oktobera sala 1981'an de Enwer Sadat serkomarê vî çaxî yê Misrê kuştin.

www.arsivakurd.org

# Zarok; hêviyên pêşerojê yan kesên dorandî



Keyhan Yûsifî

Bê guman, hewldan û guherînên siyasî û civakî di cîhanê de bi armanca jordeçûna asta rifah, tenahî û pêkanîna civakek paqij bo jiyana mirovan bûye. Pênaseyên nû erkek giran bo dewlet û desthilatan çê kiriye û dewleta demokratîk divê tenahî û rifahê bo hevwelatiyan pêk bîne.

Yasayên demokratîk jî piştevan û hegera pêkanîna edalet û wekhevbûn di civakê de ye û hevwelatî li gorî wan yasayan mafên xwe nas û daxwaz dikin. Civakên cur bi cur bo gihîştin bi civakek modern û demokratîk qonaxên dijwar derbas kirine û buha û yasayên navnetewî ên îro berhema têkoşîn û hewldanên berfireh ên jin û mêrên têkoşer di dirêjahiya dîrokê bûye.

Roja 1'ê June, roja navnetewî a zarokan e. Raste ku yasa û konvansyonên cur bi cur di civînên navnewî de hatine pesendkirin, lê em dîsan jî şahidê diyardeyên cur bi cur weke, "zarok azarî", "zarokên kedkar", "zarokên şeqaman", "îdama zarokan" û ... ne. Îran yek ji wan welatan e ku mafên zarokan binpê kiriye û li cihê ewa ku yasayên wî welatî piştevanê mafên zarokan be, hin caran bi xwe dibe rêxweşker û hegera binpêkirina mafê zarokan.

Sedema ne xûya ya di warê mafê zarokan di Îranê de, hebûna paradoksê li pênasekirina yasayî ya zarokan e. li yasaya pesendkirî a sala 1381'an a Rojî de, zarok weke mirovekê/î jêr 18 salî, tê pênasekirin, ewa di demekê de ye ku di yasayên din weke yasaya olî de, temenê zarokan bo keç jêr 9 salî, û bo kuran jêr 15 sal hatiye diyarîkirin. Di vê rewşê de pênaseyek hevbeş û wekhev bo pênasekirina zarokan di nav yasayên cezayên Îslamî de, tune ye.

Li madeya 220 a yasaya cezaya Îslamî de hatiye: Ger bav yan bapîr, zarokê/a xwe bikuje, nayê qeseskirin û tenê bi dana diye bi kes û karên xwe û "te'zîrê" tê mehkûmkirin. Lê belê kes û karên wê/wî jî wan bi xwe ne. Herweha madeya 59 a yasaya cezayên Îslamî dibêje: Dayîk û bav heya astek dikarin zarokên xwe tenbîh bikin, ku tevî yasayên piştevanî ji zarokan ku li sala 1381'an a Rojî de hatiye pesendkirin, hevaheng nine. ev jî bûye sedema kiryarên xirab ên hinek ji dayîk û bavan tevî zarokên xwe.

"zarok azarî" bi riftarên xirab tevî zarokan di warên: Cesteyî, atifî, cinsî, çewsandina abûrî, perwerdeyî, tê gotin.

Di heyamê yek meha derbasbûyî de, rojnameyên Îranê bas ji çend mînak ji "zarok azarî"ya cesteyî kirine, weke lêdana "Haniyê", 8 salî, ji aliyê bavê xwe, û "Nîma" 4 salî û agirberdana "Barbud" 3 salî, ji aliyê bavê xwe ve ku di dema encamdana wê kiriyarê madeya hişber a "Şîşe", bikar anî bû.

"zarokazarî", weke tawanek giştî tê hesêbandin û hewcehî bi şakiyek taybetî tune, lê dezgehên dadwerî li Îranê bi hebûna paradoksên eşkere ya yasayan di vî warî de, hêzek bi bandor û îcrayî tuninin.

Arîşeyek din a civaka Îranê ku sedema binpêkirina mafên zarokan e, çevsandina abûrî a zarokan e. Xûya ye ku amarek rastîn ji zarokên kedkar li Îranê tune ye. Zarokên kedkar wusa tê pênasekirin: Her mirovekê/î bi temenê jêr 18 salî ku hertim yan bi awayek werzî tevî malbata xwe yan cuda ji malbata xwe kar bike û bi sedema taybetmendiyên cewsandî ên kar ji zarokatiya xwe bêpar be, "zarokên kar", tên binavkirin.

Li gor amara fermî a sala 1385'an a Rojî, nêzîk bi yek Milyon û 660 hezar zarok mijûlî kar in. Helbet bi berçavgiritina pêtir ji sê milyon û şeşsed hezar zarokên ku di temenê dibistanê de ne û ji dersxwendin bêpar bûne, amara rastîn nêzîk bi du beramberê vê tê nirxandin.

Eva di demekê de ye ku li gor nirxandinên navnetewî, nêzîk bi pênc Milyon û heft sed zarok li Îranê mijûlî kar in.

Hêjayî gotinê ye di madeya 188 a yasayên kar de hatiye: Karkirina zarokan li karên malan, azad e û li gor madeya 196, tu pirsgirêkek bo karkirina zarokan li kargehên biçûk bi hebûna kêmtir ji 10 kedkaran tune ye, ku ev yekê bi xwe hegera çewsandina abûrî ya zarokan e yan bi awayek din "zarok azarî ye".

Yek ji mînakên hovane yên binpêkirina mafên zarokan, derkirina hukmên îdamê bo wan zarokan e ku li temenê jêr 18 salî de, tawanek encam dane.

Eva dijî tev yasa û konvansyonên navnetewî ye. Rejîma Îslamî a Îranê li sala 1373'an a rojî, bû endamê Peymana Navnetewî a Parastina mfên Zarokan, lê em dibînin ku rojane bi awayek eşkere mafên zarokan tên binpêkirin û yasa jî bi xwe sedem e û civak jî tenê temaşevan e.



# Buhayên civakî li Îranê, hicaba bi zorî pesend nake



Sadiq Vehdanî

Hicab yek ji teoriyên bingehîn yên Komara Îslamî ye û pêwendiyek kûr tevî wan û nemana vê rejîmê heye. Wate ger hicab li Îranê tune be hebûna Komara Îslamî jî di metirsiyê de ye.

Wêneya civakî a her civakekê nîşanderê esliyeta hikûmeta her welatekî ye. lixwekirina kincan li Îranê weke pirsek siyasî bo desthilatê tê hesibandin û rejîm bi awayên cur bi cur hewl dide ku wêneyek Îslamî(ji wê Îslamê ku bi xwe şirove dike) ji civaka Îranê nîşan bide.

Destêwerdana desthilatê di nav hemû mijarên şexsî û yek ji wan cureya lixwekirina kincan û dijberîkirin li hember "Bed hicaban", bi awayên nîzamî, çandî û ... nîşan ji girîngbûn û bingehînbûna vê meselê bo darêtina siyasetan ji aliyê desthilatê ve ye. Pirsa hicabê li Îranê taybet bi jinê nine û em dibînin ku peyva "Bed hicab" bo mêr jî ji aliyê hikûmetê ve tê bikaranîn.

"Agam Binê", civaknas dibêje: Li her cih û her mijarek ku Polîs destêwerdanê bike, ev mijar siyasî ye.

Hicaba bi zorî yek ji wan hewldanên rejîmê ye ku bi bê berçavgirtina rastiya civakî li Îranê, bi ser xelkê de sepandiye. Rastiya civaka Îranê hewcehî bi hicabê tune ye û tunebûna hicabê jî hegera pirsgirêkên civakî nine. Rejîm di tiorîzekirina hinek yasayên Îslamî û bi danîna yasayên paremayî ên civakî dibêje ku nebûna hicabê pirsgirêkên civakî çê dike, lê em dibînin ku bi hebûna hicabê jî Îran welatek e ku tûşî pirsgirêkên berfireh ên civakî bûye.

Em dizanin ku her yasayek bi awayek normal li gor rewşa civakî û ji nav taybetmendiyên şexsî, civakî, cuxrafiyayî û ... a her welatekê tê danîn.

Bêguman hicaba bi zorî yek ji wan yasayên paremayî ye bo kontirolkirina rifrarên civakî ên xelkê li çarçoveya nêrîna rejîmê derheq mijarên civakî ye û tu pêwendiyek tevî rastî û taybetmendiyên civakî ên Îranê tune ye.

Ji aliyek din ve pêdagîrî li ser bi zorîbûna hicabê ji aliyê rejîmê ve, bêhurmetiyek mezin û tawanbarkirina xelkê bi nezanbûnê ye. Bo mînak Ehmed Xatemî, Pêşnimêjê demî yê Tehranê, heyamek berî niha got: "Bo cihgîrkirina hicabê li Îranê divê xwîn bihê riştin".

Wate ewa rejîm e ku dirus yan nedirustbûna riftarên şexsî ên xelkê dizane!! û bo sepandina nêrîna xwe jî ji her riyek ne mirovane mifahê werdigre.

Mirov û li pey wê, civak, tu car nasekine, yasayên her dewreyek li gor guherînên bêrawestan tên şikandin. Wate tu yasayek ji sedî sed nine û pêka rewşa giştî a her welatekê tê guhertin.

Civaka Îranê weke her civakek din "Îsta" nine û yasayên kevn ên civakî jî bersivderê rewşa civakî a niha ya Îranê ninin. Li nêrîna beşek mezin ji xelkê Îranê êdî hicab weke buhayek civakî nayê hesêbandin.

Nehevahengbûna yasayên hikûmetî tevî yasayên civakî li Îranê rewşek taybetî pêk aniye, pir kêm welat hene ku ezmûna vê rewşê dîtibin.

Li tunebûna aliyên kêm ji azadiyên civakî, kiryarên ku tevî buhayên rastîn ên civakî hevaheng in pêtir bi awayek veşartî tên encamdan, jiber ku her mirovek bi awayê sirûştî hez ji azadiyê dike û di tunebûna azadiyê de jî hewl dide ku aliyê kêm riyek bo azadiyên şexsî ên xwe peyda bike.

Rewşa lixwekirina kincan li Îranê jî pêka rewşa taybetî a civakiya Îranê awayek taybetî bi xwe ve girtiye. Lixwekirina kincan li ser sînorê hicab û bê hicabiyê dimeşe. Wate xelkê Îranê bo parastina xwe ji dijkiryarên hikûmetî li hember "Bed hicaban"him hicabê li ber çav digrin û eva di rewşek de ye ku bo nîşandana buhayên civakî ên xwe û nepejirandina buhayên hikûmetî aliyê kêm hicabê li ber çav digrin, wate cureyek ji lixwekirina kincan ku di navbera hicab û bê hicabiyê de ye.

Di rewşekê wusan de pirsa hicabê bi awayê dilxwazê hikûmetê cî bi cî nabe û ev yek bûye sedema nîgeraniya desthilatdarên Komara Îslamî û bi her awayek hewl dide ku seqaya civaka Îranê bi qazanca xwe biguhere.

# 50 sal xebat di Radyoya Yerîvanê de

Sala 1918' an, pareke gelê Kurd, ku ola êzidî bûn, ji destê zulma Roma reş nava şevekê de ji cih û warên xwe ên kal û bavan qetiyan û ber bi Ermenîstana Rojhilatê koçber bûn. Nava wan de malbeta Xalidê Çolo, hebû, cerdevan û leşkerên Roma reş Xalidê Çolo tevî 50 zilamên Êzidiyan digrin û dibin û bi awayekî hovane dikujin. Lawê Xalitê Çolo, ku navê wî Seyad bû ku ji ber kuştinê xilas bibûn, di vî aliyê çemê Arpaçayê, gundê Heko de disêwirin, bi wê gumanê ku wê şer dê rawestin û ewê vegerin gundê xwe yê Êngukuyê li navça Qersê a girêdayî Dîgorê ve. Lê her tişt hate guhertin, sînor hatine dadanê. Gumana malbeta Xalidê Çolo jî bo dagêra li welêt hate birrînê. Kurê Xalidê Çolo- Seyad malêva diçe Gurcistanê û heyamekî kin bajarê Tibîlîsiyê de dimîne, piştre vedigere Ermenîstanê û li gundê Heko maleke nû datîne û dest bi jiyana nû dibe.

Keremê Seyad hema wê malê de sala 1938'an li gundê Hekoyê hatiye dinyayê. Xwendina xwe di dibistana gundê Hekoyê di dehsaleya navîn de temam dike. Hela hê salên hînbûnê de wî li pêşeya rojnamevaniyê hez kiriye.

Keremê Seyad bi nivîsên xwe bi rojnama "Bolşêvîkyan Droşov" ve tê girêdanê û gelek nivîsên balkêş dide weşandinê. Riya rojnamevaniyê rûmet pêşiya wî vedibe. Nivîsarên wî di rojnamên "Avangard", "Sovêtakan Hayastan", "Komûnîst" ên Komara Ermenîstanê û parên radyoya Yêrêvanê ên Ûrisî, Ermenî, Kurdî de tên weşandin.  Ji sala 1955'an de gelek mijarên wî li rojnama Kurdî a "Riya Teze"de ronahî dibînin û di xeberdanên radyoya Kurdî de tên belavkirin.



Sala 1960'an serokê radiyoya Ermenîstanê yê para Kurdî, rehmetiyê Xelîl Mûradov wî weke rojnamevanekî xwedî şîret, bo xebata radyoyê teklîfî para radyoxeberdanên Kurdî dike. Ewa ew dem bû, dema biryar hate qebûlkirinê ku rojê demjimêrek û nîv xeberdanên Kurdî bi radiyoyê bêne dayînê.

Bi biryara sala 1961'an, meha Nîsanê, di para radiyoyê a Kurdî de 12 karmend hatine qebûlkirinê. Di pêşbirkêyekê de 26 mirov hazir bûn, ku li komîsiya pêşekzanên Kurd û Ermenî dengên wan hazira dibihîzin.

Gerekê berê dengê wana xweş bûye, nava xwendina akila Kurmancî de cih û war bûye. Di wê pêşbirkê de dengê Keremê Seyad û Sîdarê Emînê Edal tên qebûlkirinê. Du beşa Kurdî a radiyoyê de du spîkêr jin bûne, du jî mêr. Spîkêrên jin jî yek Eznîva Reşîd bû, yek jî salekê şûnda Sêvaza Evdo bû.

Piştî mehekê akila Kurmancî ya Sîdarê Emîn nehate qebûlkirinê. Bi wî awayî Keremê Seyad dimîne tenê. Wî him ber mîkrofonê radyo xeberdan him tevî Sêvaza Evdo û him jî tevî Eznîva Reşîd raberî guhdara bikira. Wî xebata tercimekirinê û miqalenivîsarê jî dikir. Merîfeta wî ya aliyê hazirkirina radiyo kompozîsiya de jî gelek hebû.

Navbirî gelek caran rolên artîstiyê ên sereke diqedandin. Bi rêdaktoriya Xelîl Mûradovê rehmetî weke 40 radiyokompozîsiya hatine hazirkirin, nava kîjana de keda Keremê Seyad gelek heye. Tevbûna wî a tevî wan xebata ji aliyê rejîsiyorên bi eslê xwe ve Ermenî, nava demekî kin de ew ji spîkêrê dereca praktîkantiyê gihîşte navê spîkêrê dereca bilind.

Gerek bihê gotin ku dema spîkêrê radyoya Moskvayê yê cîhanê, Yûrî Lêvîtan li Yêrêvanê bû û tevî spîkêrên radiyoyê ên Kurd û Ermenî ders derbaz dikirin, dema ku têkstên Ûrisî hildida destê xwe, lê yên Kurdî û Ermenî didane destê spîkêra û dida xwendinê, ew ser xwendina Keremê Seyad mehtelmayî dima, Yûrî Lêvîtan xwendina bêqusûr a Keremê Seyad pîroz kir û karta xwe a teglîfkirinê pêşkêşî wî kir. Destpêka salên 60'an, Keremê Seyad di parê de karê rojnamevaniyê, rêdaktoriyê û tewayî spîkêriyê jî dikir.

Bo wê yekê jî piştî salên 80'an li seranserî Kurdistanê dengê Keremê Seyad dihat belav kirin. Bi hezara nivîs, înformasiya, rêportaj bi qelema wî hatibûn amedekirin û bi radiyoyê hatibûn dayînê.

Peyî jevberdana Yekîtiya Sovyeta berê re, halê aborî li Ermenîstanê xirab bû. Xelik bi massayî koçber dibû. Di wî qewilî de xelik kete nava halekî giran û riya penaberiyê dan pêşiya xwe. Nava wana de gelek rewşenbîrên Kurd ji Ermenîstanê û gelek xebatkarên radiyoyê ên beşa Kurdî ber xwe nedan û ji welat derketin çûne welatên derekî. Keremê Seyad di beşa radiyoyê de bêçare û tenê ma. Kesên tercme bikirana tune bûn. Serokê parên xeberdanên bona welatên derekeye wî çaxî Vladîk Zadayan xwest, ji bo tunebûna xebatkaran, para radiyoyê xeberdanên Kurdî bide dadanê. Keremê Seyad lawê xwe û keça xwe, Tîtal û Leylê, xebatkarên parê û kedkar Gulîzera Memê xebata radiyoyê dadane qebûlkirinê. Gerekê bê gotin, wekî Keremê Seyad bi wê yekê beşa Kurdî, ya radiyoya Ermenîstanê, xurt kir, lê warê abûrî de derbeke giran da malbata xwe.

Bo wê yekê birayê Kerem "Mirazê Seyad", derfetên baş li Rûsiyayê bona malbata Kerem amade kiribûn. Ewî ji wan re xebat, mal û jiyaneke baş amade kiribû, lê Keremê Seyad dest ji radiyoyê berneda. Rûyê wê yekê de ewî bextê Tîtal û Leylê jî xist xwendina bilind û li Rûsiyayê pêşerojeke baş hîviya wana bû. Lê beşa radyoya Kurdî bi wan kadroya ve êdî xurt bû. Bi serokatiya Keremê Seyad, wan kadroyan ji salên 90'an amedekariya bernamên xwe kirin. Ji wan bernaman bûn "Zimanê Teyî Dê", "Xerîbê Xwe Digerin", "Serhildanên Kurdan", "Rasthatin û Bîranîn", "Pêncşema Edebyetê" û bernamên mayîn.

Xeberdanên bi têlêfonê bi awayê zindî nava xeberdanan de cihê xwe girtin.  Ew telefon çawa ji Ermenîstanê, Gurcistanê û welatên Ewropayê, wusan jî ji herçar parçeyên Kurdistanê dihatin. Ew hemû xeberdan bi radyoya Kurdî dihatin dayîn û di wî warî de, nava 12 parên radyoyê de, beşa Kurdî ya here pêşîn bû. Ew yeka ji aliyê serokê radyoyê, birêz Armên Amîryan ve gelek hat pesindayîn û kivşkirina 50 saliya Keremê Seyad li para Kurdî de gelekî bilind hat nirxandin.

Keremê Seyad xebata radyoyê re tevayî pênc salan rojnama "Riya teze" de kar kiriye. Ewî korêktoriya / rastkirina şaşiyên/ rojnamê kiriye û xêncî wê, korêktoriya bi dehan pirtûkên Kurdî kirine. Ew wusa jî tevî amadekirina fîlma Kurdî a "Zerê" bûye.

Ji bo 50' mîn salvegera radyoxeberdanên Kurdî li Ermenîstanê, keda Keremê Seyad ji aliyê Serokkomarê dewleta Ermenîstanê û serokatiya radyoyê de bilind hatiye qîmetkirin. Ji aliyê serokatiya radyoyê ve ew layiqî prêmîya " Qelema zêrîn", hurmetnima û rewa bûye. Sala 2006'an Keremê Seyad ji aliyê Serokkomarê Ermenîstanê Robêrt Koçaryan de bi midala zêrîn ve hatiye rewakirinê û layiqî navê rojnamevanê Ermenîstanî emekdar bûye.

Bona xebata bênavbir a salên dirêje radyoyê, Serokkomar Robêrt Koçaryan bi xwe Keremê Seyad pîroz kiriye. Lê sala îsal di 50 salîya xebata bênavbir a radyoyê de temam bû. Van rojên dawiyê serokatiya radyoya Ermenîstanê bona hurmeta Keremê Seyad civîn pêk anî. Di vê civînê de Kerem dîsan bi hurmt qedir giran hat rewakirin. Di derbarê şerê li dijî gelê Kurd li başûrê Kurdistanê de, radyoyên dinyayê agahî didan. Guhê Keremê Seyad tim li ser radyoyê bû. Ewî her dem bi hisreteke xerîbiyê aliyê Başûr dinihêrî û difikirî, ka wê rojek bê, Kurdistan azad be û ew here welatê xwe bibîne.

Dengê Keremê Seyad her roj li Kurdistanê belav dibû, lê wî bi xwe Kurdistan nedîtibû û timê bi hisret dima. Armanca Kerem bicih hat, sala 2001'an wî Kurdistan dît. Sala 2005'an jî Keremê Seyad ji aliyê serokatiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê ve hat teklîfkirin.

Ewî Kurdistana azad dît û li her deran geriya. Ew weke hec diçe ser tirba Barzanîyê Nemir û Qazî Mihemed, li ber meqberên wana serê xwe ditevîne. Keremê Seyad niha tevî malbeta xwe li Yêrêvanê jîyan dike. Ew dîsa serokê beşa radîoya Yêrêvanê a Kurdî ye. Kerem çar zarok û neh nevî û du nevîçirk hene. Ewî zarokên xwe baş  perwerde kirine. Tîtal bavê sê zarokan e, rêdaktorê sereke yê rojnama "Rya teze" ye.

Du zarokên wî li zanîngeha dewletî de nûjdarîyê dixwînin. Keça Kerem a mezin "Annê" li Rûsiyayê hiqûqzan e. "Leylê" xebatkara radyoya Yêrêvanê ye." Laûra" kevaniya mala giran e, sê zarokên wê hene.

**Tîtalê Kerem**

www.arsivakurd.org

# Çand peyvek cihgirtî û bê sînor




Ceifer Mubeşirniya

Peyva çand bi manaya kultûr yan ferhengê di wêjeya kurmancî de cih girtiye. Lê ji ber ku kultûrê manayek pirr berbelav û giştgîr heye û xwedîrayên şareza di vî warî de heya niha jî ji bo pênaseyek têr û tesel ku bikare bi tewawî manaya ferheng yan kultûrê bide yan ji diyarîkirina çarçoveyek ji ferheng "culture" ê re, negihîştine tu encaman.

Heta bas ji vê yekê jî tê kirin ku ferheng û kultûr jî deqawdeq manaya hev nadin, peyva çand jî her bi wî awayî ku dê bikare manaya tewaw ya ferheng yan kultûrê bide, bêencam e. Lê bikar anîna peyva "çand" li gor wêjeya Kurdî, di vê mijarê de bi manaya ferhenh "culture" ê hatiye.

Peyva "Çand" pêtir li welatê Firansayê ji kultûr "culture"ê çavkanî girtiye ku bi derbasbûna demê di halê guherînên berdewam û cur bi curiya manayan de bûye. Di serdemekê de çand bi manaya bawerên mesebî û hin manayên din hatiye bikaranîn, lê di sedsala 18'an de, di çarçoveyek diyartir de bi manayek giştgîrtir wate perwerdeya derûnî nav derxist.

Sirûştî ye ku perwerde ji bo pêşkevtinê ye, lewma di pêvajoya zeman de li Ewropayê çand ji bo nîşandana tekmîlbûn di pêşkevtinê de hat bikaranîn. Lê dîsan jiber ku pêşkevtin bêdawî ye, pêvajoya



pêşkevtinan di hemû waran de bi taybetî di warên hizrî de berdewam bû, çand bi manaya pêşkevtina hizrî ket ser zimanan û di pêşkevtinan de jî dîsan manayek berîntir ji xwe derxist holê, wate bizavek ber bi pêş ve.

Ji bo pêtir eyanbûna berîniya manayên çandê û pêdagirîkirina li ser çarçove û sînorên çandê, hewce ye çend mînakek ji rayên şarezayan di vî warî de bikeve ber dîda xwendevanan. Taylor: Çand yan bajêrvanî, bi giştî li cem hevûdin re ku zanîn, huner, ol, yasa, exlaq, tîtal û edet û her cure şiyan û edetên ku mirovek weke takek civakê bidest dixe, ji xwe digre. Kilakun: çand bi manaya wesfek ji manayên xizîneya afirandinên mirovan e.

Sapîr: Çand yanî komek ji kiryar û bawerên bihevre girêdayî ku di riya civakê de mîras maye û pêkhateya jiyana me çê dike.

Bos: Mirov dikare çandê ji wan riftaran bide zanîn ku di navbera girûpek ji mirovan de hevpar in û ji nifşekê bo nifşa din û ji welatekê bo welatê din hatiye veguhastin.

Kilîford Gîrts:Mirov rihliberek e ku di torên manayan ku bixwe divehûne giriftar dibe. Çand jî yek ji wan toran e, lewma nabe çand weke zanistek ezmûnî ku di şopandina yasayê de ye bihê nirxandin û şirovekirin. Belkî gerek mirov di hizra şopandin û vedîtina derbirîn û nîşandana mana û kakila vê de be.

Herwek di nêrînên şarezayên binav û deng ên cîhanê di warê pênaseya çandê de eyan e, pêvajoya guherîn û berbelavtirbûna manayên çandê, qonaxên cur bi cur derbas kirine û îro di gişt cîhanê de ji bo pêşxistina jiyana mirovan di nava hemû pêkhate û netewên cîhanê de cihgîr bûye û li jêr nav û pênaseyên cur bi cur de xwe derbasî qonaxa îro kiriye û hin perwerde û pêşketin bi tewawî bi navê xwe kirine, weke wêje û belavok, mûzîk, stran, werziş, dans û govend bi giştî, sînema û ragihandin ku hina beşek herî girîng a jiyana mirovan in.

Her çend ku çand tenê bi manaya wan çend mînakane nine, lê bi teikîd mînakên han bi tewawî xêncî karên çandî manayek din nadin..

Lê dîsan jî bi vê manayê nine ku çand beşek taybet û diyarîkirî a jiyana mirovan e û têkilî ji beşên din ên jiyanê re sînordar e. Belkî di çawaniya riftarkirina tak, girûp, netewe û îdarekirina dewletan û cîhanê de, rolek girîng û sereke dilîze. Bo mînak di warê civakî de li gor çanda her netewe yan girûpekê mirov dikare asta bajêrvaniya wê civakê binirxîne. Ku wa ye, çanda mirov e ku şîweya riftarkirina bi xelkê re di hemû warên jiyanê heta di gengeşeyên siyasî, civakî û olî de jî diyarî dike û dixe ber çav. Her weke ku îro tê xuyakirin, yek ola esmanî, di nava çandên cuda cuda de wekhev di pêvajoya jiyana wan oldaran de nahê bikaranîn yan mêzekirin, belkî her girûpek civakî yan neteweyek li gor çanda xwe, xwe li gel ola ku yek yasa û yek pirtûka esmanî heye, hevaheng dike û riftarê pêre dike.

Ji bo rohnbûnek pêtir a vê pirsê di pêwendî li gel rolê çand ê di nava îdeolojîk û sîstemên berteng de, baştirîn û zindîtirîn mînak, desthilatdariya 33 saliya Komara Îslamî a Îranê ye ku bi hemû hewl û tepeserî û givaşan, nekariye çandên cuda cuda ên netewên Îranê stûxwarên yasaya yekçandî ku rejîma han dibêjê çanda Îslamî ye bike, û îradeya xwe bi ser wan de bisepîne. Yan ji aliyek din ve, ezmûna bi encamgihîştî a vê rastiyê, perçe perçebûna îdeolojîka Yekîtiya Sovyeta berê ye ku îdeolojîka han nekarî çandên cuda di bazneya berteng a xwe de yekreng bike û berbi yek çandê ve bibe.

Niha jî cîhan bi giştî di vê qonaxê de ye ku li her der mirov ziman, meseb, buhayên jiyanê, sunnet yan diyardeyên xwe, qabilî guherîn û pêşveçûnê dizanin û ji bo pêşkevtina van warên jiyanê ku aramî û bihevrejiyanê pêk tîne, pêtirî her tiştî çand rolek sereke dilîze, çimku manayek çarçovedar û berteng a sînordar nine, belkî ji bo pêşkevtin û pêtir manabexşîn bi jiyanê, her mirovek pêşkevtinxwaz rû li karên çandî dike û her wek girîngîdana saziyên siyasî bi xebatên çandî ji bo gihîştin bi mafên xwe bi eşkerayî dixûye.

Li encama vê ezmûnê mirov de digîje vê qenaetê ku di pêvajoya pêşkevtina çandî de, her yek ji qonaxên pêşkevtinan, hizr, riftar û kiryarên nûtir ji mirovan re derdixe holê û bi ser mirovan de ger nexwaze jî, disepîne.

# Tu



Can Kurd

Tu hindiva çavê minî
Cerg û serî, mala minî
Çendî tu rind û rûgeşî
Naz û ciwan û çavreşî

Boyî tu carek serkevî
Rabî ji tarî derkevî
Wekî gula bibişkivî
Aza bibî, bi pêşkevî

Gel da xwîna xwe ji ter'
Mêr û peya kuştin di ber
Herdem em in li ceng û şer
Boyî jiyanek bê keser Navê te bû ava jiyan
Baranî tu ji bo çiyan
Dilşane pê bav û diyan
Derkev ji bin perda şevan

Ey Kurdistan, ey Kurdistan
Ey Kurdistan, ey Kurdistan...

Cankurd / 1973

**Guh bidêrin**

Guh bidêrin dengê tenbûr û sema
Bibihîsin sazê baran û çema
Derd û jana Kurdê bindest
Qîr û fîxan û xema
Diweşin mîna pelên zer,
Ma ji derdê min çima?
Tova rojê dayî mala
Rabûye karwanê pala
Xweşiyar e gel bi ala
Ma ji tirsa min çima?
Bad û bahozan dinalin
Em hemî xêzan û lalin
Dest û zendên xwe vemalin
Kes ji bindesta nema
Cejna Nûroj û bihar e
Agirê Kawa li dar e
Rêberê gel her şiyar e
Ma ji tirsa min çima?
Leşkerê Kurdan bi hêz e
Lawî Kurdan tev li rêz e
Herwekî reşba dilîze
Ma ji tirsa min çima?

1974

Malpera: welatperwer

www.arsivakurdi.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com




## 300 kesên pêwendîdar bi narkotîkê di Îranê de li benda îdamê ne

**Ebas Ceiferiyê Dolet Abadî, dozgerê giştî yê Tehranê bas ji derkirina hukmê îdamê ji bo 300 qaçaxçiyên madeyên bêhişker kir.**

Eve jî li halekê de ye ku Komara Îslamî bi xwe sebebkarê sereke yê belavkirin van madeyan û bengdarkirina xelkê di Îranê de ye û ji riya spaha pasdaran ve jî tiranzîta wê bo derve dike, lê em dibînin ku zû kesên belengaz û binav qaçaxçî digre û îdam dike û dixwaze weha nîşan bide ku li dijî narkotîkê xebatê dike.

Di nava wan 300 kesan de kesên weha hene ku tenê 30 girem Hiroyîn li destê wan de hatiye girtin.

Ji yekemîm meha sala 2011'an ve bi dehan kes bi vê tawanê hatine îdamkirin.

**Temenê bikahîneran her roj dadikewe**

Pêka vê siyaseta rejîmê, niha beşek ber bi çav a xelkê Îranê tûşî



îtiyadê hatine û ya herî karesatbar ev e ku niha jiyê bikarhîneran hatiye xwar, û gelek nûciwan û zarokên qutabxaneyan jî tûş bûne. Li vê derheqê de endamekî Komîsyona Tendurustî û dermanî yê Parlementoya Îranê ragehand: " Mixabin bi sedema kêmkariyên me, niha heta qutabiyên qonaxa nawendî jî madeyên hişber bikar tînin.

## Saziya tendurustiya cîhanî serjimêriya qurbaniyên cixarekêşanê eşkere dike

**Saziya tendurustiya Cîhanî ragehand ku tê texmîn kirin, îsal bi egera cixarekêşanê 6 milyon kes canê xwe ji dest bidin ku 600 hezar kes ji wan cixarekêş ninin, ew yek nîşaneya vê ye ku deshilatdariyan tu hewlek bo kêmkirina zirara cixarê nedane.**

Saziya Tendurustiya Cîhanî (WHO) eşkere kir ku bandorên nerênî ên cixarekêşanê piştî borîna demek dirêj derdikevin. Salê hejmara kesên ku bi egera cixarekêşanê canê xwe ji dest didin li zêdebûnê de ye, herwha tê pêşbînîkirin ku heya sala 2030'î hejmara ên ku bi sedema cixarekêşanê canê xwe ji dest bidin, bigîje 8 milyon kesî.

"WHO"ê daxwaz ji deshilatdariyan kiriye ku peymannameya qedexekirina



cixarekêşanê wajo bikin. Herweha hişdarî daye ku heke bi vî awayî xemsarî hebe eva li sedsala 21'an de hejmara wan kesên ku bi egera cixarekêşanê canê xwe ji dest didin, bigîje yek milyard kesî . Eva jî di demekê de ye ku li sedsala borî de tenê 100 milyon kesî canê xwe ji dest da.

## Rûniştina bi jinên bêhicab re çawa ji canê dijî bêhicaban re xweş tê!!



**Wezîr - terorîstê rejîma Îranê yê dijî bêhicaban li sefera nivîşkan a xwe bo Bulîviyê**

**li navbera jinên bêhicab de rûnişt.**

Wusa xuyaye ku ji canê wî xweş hatiye û derbasbûya xwe ji bîr kiriye.

Kurt û kurmancî ji wan re helal û ji xelkê re heram e.

Ew tawanbar e ku li teqîna li bajarê Boinos Ayrisa Arjantînê de dest hebûye, lewra navbirî ji aliyê "Înterpol"ê ve tê teiqîbkirin.

## Serdozgerê giştî ê welat wek dadwerê herî dijî jin yê cîhanê hate hilbijartin



Muhsinîyê Êjêî serdozgerê giştî ê welat wek dadwerê herî dijî jin ê cîhanê xelata navnetewî ya batom (çomaq)êwergirt.

Saziya pêwendiyên cîhanî ê jinan ku hemû salê baştirîn û xiraptirîn dadwerê cîhanê di warê bandora erênî û nerênî ya dengdanên wan di warê dadperweriya zayendî de hildibjêre, di daxûyaniya xwe ya çapemeniyê de, amaje bi vê yekê kiriye ku: "Xelata batomê bi Dîwana Bilind a Welat tê dan, jiber ku biryara telaqê ji jinê wergirtiye heta heke mêrê wî jinek din jî anîbe".

Ji bilî serdozgerê giştî yê Tehranê, 23 dadwerên din jî ji welatên cur bi cur bo vê xelatê hatibûn berbijarkirin.

## Çiyagerekî din ê Kurd hilkişiya ser çiyayê herî bilind ê cîhanê



**Çiyagerê Kurd, Hemîd Dêhqan, roja Pêncşemî, 19'ê Gulanê, hilkişiya ser çiyayê Êwêristê û xwe gihand bilindtirîn kopika wî çiyayî ku bilindiya wê digîje 8848 metroyan.**


Hemîd Dêhqan xelkê bajarê Sinê de, bi bê mifahstandin ji oksîjinê, bo bîranîna çiyagerê bi nav û deng yê Kurd, Mihemed Hewraz û bo zarokên tûşbûyî bi nesaxiya penceşêrê li Kurdistanê, xwe gehande kopika bilindtirîn çiyayê cîhanê.

Hemîd Dêhqan, roja Sêşemî, berwar 31'ê Gulanê, tevî pêşwaziya germ a hevwelatiyan, werzişdost û çiyagerên Kurdistanê ve bi silametî vegeriya cih û warê xwe.

## "Luna" yekem robota jin e ku karên di mal de encam dide

**Di vê serdemê de robot zirarê digehîne wan jinên ku wek xizmetkar di nav malan de kar dikin, jiber ku cure robotek hatiye çêkirin ku wek jinan dikare karûbarên di nav malê de birêve bibe.**

Kompaniya bi navê "Schultze Works" yekemîn robota jin bi navê "Luna" çê kir ku li heyamek nêz de dikare karûbarên nav malê de birêve bibe.




"Luna" ji riya programek taybet û bi nirxek navincî ve karûbarên nav malan de wê birêve bibe.

Ew robot bi teknîkek gellek pêşketî û rûyekî ciwan û balkêş hatiye avakirin.